

CENGA MIŞK Û PISÎKAN
HÛTÎ ASLAN

CENGA MIŞK Û PISÎKAN

Nivîskar: Hûtî Aslan

Çîrok: 05 / 17

Gerîmendeya Weşanê: Eslîxan Yildirim

Sererastkirin: Eslîxan Yildirim

Rûpelsazî: Şemal Medya

Wêneyê Bergê: Detayek ji tabloyên Şerefnameyê

Çapa Yekem: Weşanên Azad, 2021

Çapxane:

Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayımcılık San. Tic. Ltd.
Şti. Sanayi 1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1 İskitler/Ankara
Sertifika No: 42488

ISBN: 978-605-81463-6-5

Navnîşan:

AZAD YAYINEVİ

Viranşehir Mah.

34330. Sk. No: 15 A/4

Mezitli / Mersin

Sertifika No: 40407

Web: www.wesanxaneyaaazad.net

E-mail: agahi@wesaxaneyaaazad.net

© Mafê vê pirtûkê parastî ye.

© Ji bilî danasînê bê destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.

CENGA MIŞK Û PISÎKAN

HÛTÎ ASLAN



HÛTÎ ASLAN

Hûtî Aslan di sala 1945an de li gundê Hatxê ya ku niha bi navçeya Nisêbinê ve girêdayî ye hatiye dinyê. Di zarokiya xwe de heya pênc salî li gund maye. Weke zarokên gunda çî kar hebe kirîye. Dibistana seretayî û ya navîn li Nisêbinê, xwendegeha jî bo huner jî li bajarê Edirne (bajarekî Tirkîye ku li ser sînorê Bulgarîa cîh girtîye) xwendîye. Ji bo zankoyê bixwîne di serê sala 1970yî de çûye Almanyayê û perwerdeya xwe ya endezyariyê û mastira xwe jî li Almanyayê qedandîye. Sala 1980yî de vegeyîyaye Tirkîyeyê. Li vir 32 sala di kare dewletê de xebitîye û di sala 2014an de malnişîn bûye. Hûtî zewicîye, xwedî xwe û sê zaroka ye. Bi Kurdî, Tirkî û Almanî zane. Hûtî Aslan di xwendegeha navînê de dest bi nivîsandina helbesta kirîye. Helbesta yekem ya bi navê “Dara Gûzê” di sala 1964an de nivîsîye. Jê û pêde helbestin din, di salên cûr be cûr de nivîsîne. Wekî din, xebatên mîna bîranîna, pêkenînê Kurdî û meqaleyên ku li ser mijarên di rojevê de ne dom dike. Ev pirtûka Çîrokên Kurdî ku neha di dest we de ye pirtûka Hûtî Aslan ya 4emîn e. Ji xeynî ve pirtûkê pirtûka hin çîrokin Kurdî bi navê ARÎN jî bo zarokan di sala 2019an de, pirtûka AXÎN ya helbestan di sala 2021 de hatine weşandin. Wekî din pirtûkek din ya evîndariyê ku bingeha xwe li ser serpêhatiyekê ava kirîye ya bi navê “MAMEDO û ZEKO” di rîya weşanê de ye.

NAVEROK

Pêşgotin.....	7
Çîroka Mihemed	9
Lawê Şareze	22
Çêlîka Quling	24
Çêlîka Werdekê Ya Qefçîl	26
Gwêşîkî Tirî	28
Gur û Çeqel	32
Sûcdarî	33
Evîna Gul û Bilbil	35
Keça Mîr	40
Şivanekî Pêşverû	42
Şêr, Gur û Rovî	48
Dermanê Êşê	52
Çîroka Xortekî Bijîjk	54
Tûrkê Kerenga.....	56
Minminîk (Baperîk)	59
Elîkê Sêwî	61
Lîla	68
Xatê û Biro	70
Barkêş.....	74
Behlûl-î Zana	76
Cenga Mişk û Pisîkan	78

Ê Ku bi Siûda Xwe re Diaxife	84
Germahîya Şewqê	86
Gur û Rovî.....	89
Xêr e An Şer e	92
Dîk û Rovî.....	94

PÊŞGOTIN



Edebiyata Kurdî kevnare û gelekî jî dewlemend e. Nivîskarî Kurd xwedî xwe û dîrokeke dûr û dirêjin. Edebiyata Kurdî bi taybetî ji alî nivîsaran ve gelekî kûr e. Dema em dibêjin “Edebiyata Kurdî” bêhtir roman, kurteçîrok, helbestên serbest, şanoyên ku di van salên dawîn de hatine nivîsîn tên bîra mirov. Lê wekî dîrok û çanda Kurdan, edebiyata Kurdî ya klasîk jî xwediyê rabirdûyekî kevn e. Dema ku behsa edebiyata Kurdî ya nûjen, an jî qala pirtûkên Kurdî bê kirin, nivîskarên navdar weke Merhûm Mûsa Anter, Mehmed Ûzûn tên bîra mirov û weke nivîskarên Kurd bi xebat, berhem û pirtûkên xwe yên Kurdî xizmetek hêja ji çand û edebiyata Kurdî re kirine. Mebesta me jî bi vê xebata nivîsarin Kurdî ên kurt ev e ku, em li ser jiyana Kurdan a civakî vekolînekê çêbikin, di pêşerojê de bi van nivîsara ciwanên Kurd xwe baştir nas bikin û xwe jibîr nekin. Armanceke din jî ew e ku heya niha di nav dîroka mirovan de huner û çanda Kurdî bi rastî nehatiye naskirin, ji ber ku heya niha dera ku Kurd lê dijîyan Kurdi qedexe bû.

Di van çend salên dawî de, min xwest ku ez li ser çîrokên Kurdî lêkolînekê fireh bikim. Di vê pirtûkê de bi 26 çîrokan em li pêşberî we ne. Piraya van çîrokan min ji çîrokê Kurdî ên devkî yê herêma me dane hev û derbasî nivîsê kirine;

çend çîrok jî yê ku min bixwe nivîsîne. Di naverokê de min nave xwe li ber yê ku min nivîsîne daniye.

Di van pêvajoyan de alîkarîya malbata min pir bi min re çêbûye, gelek spasîyê xwe pêşkeşî wan dikim. Ez hêvîdarim ku ev xebat hebekî bibe alîkar ji bo neqilkirina çand û hunera Kurdî ji siberojê re. Heger gelê Kurd li çand û hunera xwe xwedî derkeve, ez bahwerim ku ev çand û huner heya dinya hebe wê bijî.

Hûtî Aslan

ÇÎROKA MIHEMED



Ev çîrok dema ez zaro û bi qasî dehsalî bûm, pîrka min Nûrko ji me re digot. Ev çîrok çîrokek geleri ye, weke pîrka min digot dibe ku ev çîrok ne çîrokek rastîn be lê çîrokek ku ji efsaneyên Kurdî tê. Gelek çîrokê wisa di çanda Kurdan de hene. Rehma Xwedê li pîrka min be, rehmetyê her şev ji me re çîrokek digot; ji ber ku wan dema tiştêkî em zarok pê mijûl bibin tunebû. Dema pîrka min çû ser dilovanîya xwe, bi qasî 110 sal kiribû. Xwezî zanîba ku ev çîrok wê rojekê têkeve nav nivîsa Kurdî.

Xwedê giravî mîrê welatekî gelekî dûrî van dera hebû. Mîr xwedî xwe û sê lawa bû. Hersê law ji hev mêrxas û wêrektir bûn. Lê qederê salekê xela bi ser welatê wan de hat û maldariya xwe hemû winda kirin. Mîr bixwe pîr û kal bû, nema karîbû kar bike. Welatê mîr roj bi roj ber bi xerabîyê ve diçû. Hersê lawa ji bavê xwe re gotin: “Yabo, em dixwazin derkevin derî welat. Dibe ku em ji xwe re cîhekî hîn baştir bibînin ku em malbata xwe li jiyane bihêlin û koka me dom bike. Heger em li vir bimînin em ê jî bimrin û em ê kurdûnde bimînin.”

Hersê xorta biryara xwe da û ji bavê xwe xatir xwestin, destê bavê xwe maçî kirin û ketin ser riya xerîbîyê. Hersê bira bi roja meşîyan, gelekî demin ne xweş derbas kirin, bi rojan birçî û bê av man.

Piştî demekî dirêj gihan bajarekî. Xwestin li vî bajarî rawestin, çimkî li wan bibû evar. Li deriyê mala ku pêşî gihanê xistin, lê tu kesî derî venekir. Li dora malê çar alî gerîyan lê pêjna tu kesî nekirin. Ji ber ku derî girtîbû neketin hundurê malê. Lê nerîn ku deryê mala cîranê wê malê vekirîyê, bi lez ketin hundurê malê. Nerîn ku kesek di malê de tune, ji xwe re çira pêxistin. Dîtin ku mal tişê xwarin e, qûtê salekê têde heyê. Hinek xwarin xwarin, hingî betilîbûn hersê bira bihev ketin xew û du rojan di xew de man.

Piştî du roja ji xew rabûne, nerîne ku bajarekî mezin e lê tu kes li jîyanê tunene, ev bajar vikî vala ye. Hersê bira mane şaş û ecêbmayî. Piştî axavtinek dirêj, sê bira biryara xwe dane ku li vî bajarî bimînin. Û gotine; di dawî de dibe ku em herin xwedîyê xwe, bavê xwe jî bînin vira.

Hemû xwarin, hemû fêkî, her tişt hebû lê goşt tunebû. Hersî bira biryar dan ku rojekê yek li mal bimîne û herdûkê din herin nêçîrê, ji bo ku ji xwe re goşt bînin. Birayê mezin gotîye ez ê li mal bimînim ji we re xwarinê çêkim, hûn herdûk herin nêçîrê.

Bûye sibe, birayê biçûk û ê navê çûne çolê ji bo nêçîrê, birayê mezin li mal maye. Bire mezin ji sibeh ve rabûye dest bi çêkirina xwarinê kirîye. Beroşik girara birinc û beroşik tîrşîka bacane reş û beroşik fasûlî çekirîye. Berî ku birê wî bîn malê, nerîye ku zilamekî por sipî û qam kut û rîha wî gelekî dirêj ku bi dû de weke werîsekî dikîşe. Birê mezin şaş maye, çimkî di jiyana xwe de tiştekî wisa bi ecêb ne dîtîbû. Zilamê kal silavê lê

dike û dibêje; ka xwarinê bide min. Birê mezin dibêje; tu kîye û çima ez ê xwarinê bidim te. Kalo dibêje; ev bajar hemû ê min e, çiqas mirovê hebûn min hemû tev zaroka xwarine, ez ê vê xwarinê û te jî bixum. Yek ji wî yek ji kalo dikevin pevçûnê. Kalo têra birê mezin lê dixwe û li erdê dike pîj. Kalo xwarinê hemûyî dixwe, teşt û beroşa jî dalêse û dire.

Piştî çend seeta herdu bire ku çûbûn nêçîrê vedigerin malê, lê li çi binerin! Birayê wan li erdê direjkirîye û hemû derê wî bi xwîn e. Cil û bergê wî hatine çirandin. Pê lebikîne heya anîne ser hişê xwe. Bira pirs kirine; gidî çi bi te hatîye. Birê mezin gotîye: “Min xwarin ji we re çêkiribû lê ji nişka ve zilamekî qamkut bi qasî nîv metro dirêj kete hundur, xwarin xwest min nedayê. Ez û wî me pevçînî, bi rastî têra min li min xist û ez kirim vê rewşê.” Birê navê got; baş e ez ê sibe li mal bimînim, hûn herin nêçîrê.

Sibehê zû birê mezin û yê biçûk derketine, birê navê maye li mal. Wî jî beroşik birinc û beroşik tîrşik çêkirîye û li bende herdu birê xwe maye. Dîsa ew zilamê qamkut, kal û rîh dirêj ketîye hundur, silav lê kirîye û gotîye; ez hatime xwarinê bixum. Birayê navê gotîye; tu xwarinê nikarim bidim te. Yek ji wî yek ji kalo dîsa pevçûne, kalo têra birayê navê jî lê xistîye û ji hal de xistîye, birê navê jî li erdê kirîye pîj.

Roja sisya birê biçûk gotîye; birê mezin û birê navê, hûn herin nêçîrê ezê îro li mal bimînim ji bo ku ez ji we re xwarinê çêbikim. Birê biçûk serê sibehê dest bi çêkirina xwarinê kirîye, bûye danê êvarê xwarin qedîyaye. Birê biçûk nerîye ku weke birê wî gotine, zilamekî qamkut û rîh sipî kete hun-

dur, silav lê kir û got; ez hatime xwarinê bixum. Birê biçûk gotîye; ez nikarim xwarinê bidim te, çimkî ev xwarin min ji bo birayên xwe çêkirîye. Kalo gotîye: “Ez ê ji te re bêjim. Biner, ev bajarê mezin ê min e. Evqas mal û mevdan ê min in. Evqas kesê ku di vî bajarî de hebûn min hemû xwarine, ez ê te û xwarina te jî bixum.” Yek ji kalo yek ji birê biçûk xwe kişandine hev, di navberekê de birê biçûk kêrek li newqa kalo xistîye. Kalo ji êşa xwe re ji malê derketîye û çûye.

Bûye êvar herdu bira hatine malê, nerîne birê biçûk li male û xwarina wan amade ye. Jê pirsîne; çibû gidî! Birê biçûk gotîye: “Berî bi seetekê, weke we digot kalo hat, me pevçinî. Min kêrek li newqa kalo xist, kalo birîndar bû û ji êşa xwe re bazda çû.”

Hersî bira li hev rûniştine, şîva xwe xwarine û birê biçûk ji herdu birayê xwe re gotîye; bi vî awayî nema çêdibe, heya ev kal miseletî me be em nikarin bi xweşî li vî bajarî bimînin û jiyana xwe dom bikin. Herdu birê wî jê re gotin; ka em dikarin çî bikin. Birê biçûk gotîye; du rê hene, ya yekem divê em vî kalî bikujin a duyem divê em vî bajarî terk bikin û herin derin din.

Hersî bira biryara xwe dane ku wî kalî bikujin, lê ka bi çî awayî. Hersî bira xwe bi çeka girêdane, şûr û xincer li xwe pêçane û serê sibehê derketine derî malê. Dîtine ku xwîna kalo li ser erdê rijîyaye, hersêka daye dû şopa xwînê û meşiyane. Şopa kalo birine ser bîra avê. Lê li bîrê nerîne ku tu av di bîrê de tune ye, bêhnik genî û hilmek gelekî germ ji bîrê tê der. Yanî kesek nikare ji germa û bêhna genî debar bike.

Birayê biçûk cegerê xwe anîye xwe û gotîye: “Min bi werîsa girê bidin û dahêjin bîrê. Heger min got, gelekî germe min derxînin divê hûn min nekşînin jor, min berdîn berjêr de.” Herdû bira birê xwe nî biçûk dahijtine bîrê. Birê biçûk çend cara kirye hewar; gidî min derxin ez peritûm, lê herdû bira birê xwe berdane berjêr de heya gihaye bine bîrê. Birê biçûk nerîye binê bîrê çiqasî firehe, weke hundurê qesra axa û paşa ye, hundur tije zêr û mêre. Çiqasî malê biha heyê di vî cihê de ye. Bire biçûk maye ecêbmayî.

Wekî din nerîye, sê keçik jî li alîkî runiştine. Lê belê ev hersê keçik hivqasî xweşikîn û tu dibêje qey xweşikbûn jî kesekî re nehiştine. Hersê keçik jî xortê ciwan dipirsîn; tu kîye tu çawa hatîye vê derê. Heger xwedîyê vê derê kalê qamqut bi te bihese wê te jî û me jî bikuje û wê me bixwe. Xort gotîye; kalo li ku ye. Keçika bersiv dane û gotine; kalo jî doh ve birîndare û di dawîya bîrê de di xew de ye.

Xort gotîye; min kalo birindar kirîye û ez ê herim wî bikujim. Keçika gotîye; şûrê kalo li ber serê wî ye, heger te rahişt şûr û bi derbek tenê re te kalo kuşt te kuşt, ger rabe ser xwe gelekî zor e, wê me herçara bikuje. Xort bi awayekî bê his dire radihêje şûr û di ser kalo re disekine. Kalo çavê xwe vedike û dinere û berî biaxive xortê ciwan fersendê nade kalo, derba xwe li kalo datîne û kalo di nav xûnê de dihêle. Piştî demek kin kalo di nav xwîna sor de nefesa xwe nî dawî dide û dimre.

Hersê keçikan spasî xortê ciwan kirine, jî bona ku ew hersê keçik jî bin deste kalê zalim azad kirine. Xortê ciwan

xwe bi naskirin dide û dibêje: “Navê min Mihemed e, du birayê min î din jî hene. Em hersê jî azibin, yanî em hîna ne zewicîne. Heger hûn bixwazin em karin bihevrebibin malbatek mezin.” Keçik dibêjin; baş e em jî dixwazin, çimkî va te em azad kirine, ne mumkun e ku em kesin ji we baştir bibînin.

Mihemed dibêje; herdu birayê min li jor li ser devê bîrê ne, ez dixwazim keçika mezin bişînim jor, ji bo ji birayê min î mezin re be. Bang birayên xwe dika û dibêje: “Biranno! Va min kalo kuşt, em jê xelas bûn. Mizgîniya min li we; sê keçik jî hene li vê derê, keçika mezin ji bo bîrê mezin, keçika navê jî bela ji bo birayê navê be û keçika biçûk jî ji bo min e.” Birayê wî jî van dibihîzin, kêfa wan tê û dibêjin; bela ka wan yek bi yek bi werîsa girê bide, em ê wan hilkişînin bi jor de.

Cara ewilî keçika temenê wê mezin dişînin jor berî keçik ji bîrê derkeve hersê bira dinerin û dimînin şaş û ecêbmayî. Çimkî dibêjin qey stêrika serê sibehê ye û nûn derketîye ji ezmana daketîye ser rûyê erdê, hîvqasî xweşik e. Keçikê derdixin, bîrê mezin dibêje; ev ji min re ye.

Mihemed vê carê werîs û benna li newqa keçika navê girê dide û dibêje bikşînin. Berî keçik derkeve jor carek din ecêbmayî dimînin, çimkî tu dibêje qey ji bîrê heyvek çardeh rojî derdikeve. Bîrê navê dibêje; ev jî ya min e.

Dor hatiye keçika biçûk, lê keçik naxwaze berî Mihemed derkeve, dibêje: “Mihemed bela bîrê te pêşî te derxînin. Piştî tu derket, dûra bi alîkarîya te jî hûn ê min derxînin.” Mihemed dibêje; çima tu wisa dibêjî. Keçik dibêje: “Weke ku tu

zanî ez ji herdu keçîka xweşikîrîm. Mîrov şîrê xav xwarîne, dema ez derkevîm birê te çav min bikevî, kare dilê wan xera bibe û bêbextîyê li te bikin. Karin te di birê de bihêlin, te bikujin û min ji xwe re bibin.”

Mihemed pir diqehere û bi ser keçîkê hildibe, dibêje: “Tiştê wisa dibe? Birê min tu cara bêbextîyê li min nakin. Tu pêşî derkeve dûra ez ê derkevîm. Heger tu pêşî dernekeve ez ê ne rehet bim.” Keçîk dibêje; bela lê ji te vê hungulîska min têxe destê xwe, çi dibe çi nabe bela ev nişana min be û bi te re be.” Û keçîk dom dike: “Heger tiştêk biqewime û tu ma di birê de; li ba cihê kalo qutîk heye, di qutyê de du perî hene, yek sipî a din reş e, herdu perîya li hev xe wê du beranê qoç derkevîn pêşberî te. Ev beran wê li hev bixin, li ber çavê te wê geh yê spî bibe reş, yê reş bibe spî. Gerek tu gelekî bala xwe bidêyê ku tu xelîtyê neke; tu li beranê sipî siwarbe wê te derxîne ser rûyê erdê, heger tu li yê reş siwar bibe tê heft tebeqa di bin erdê de here.” Piştî keçîka biçûk tembîyê xwe dike, werîs li newqa xwe girê dide û wê dikşînin jor.

Dema herdu bira çav keçîka biçûk dikevin, deve wan ji hev dimînin çi bêjin fêde nake, weke rokê ku nuh derdikeve şewqa xwe dide hundurê birê. Û hemû der û hemû tişt ji xweşikbûna wê wînda dibe; ma karxezale, heyv e, rok e... çav, burh, mijang, qam û endam, bejna zirav, weke ku kesekî bi qelemê çêkirîye. Herdu bira ji hev re dibêjin: “Birê me nî biçûk em xapandine, keçîka herî xweşik ji xwe re hiştîye. Û piştî derkeve kare bêje min kalo kuştîye û dawa meznayê li me bike, li serê me bibe mîr.”

Herdu bira dilê wan xera dibe û naxwazin birê xwe ji bîrê derxînin. Birê biçûk çend çewal zêr jî amade kirine ku bi xwe re hilkişîne jor, werîsa li newqa xwe girêdide û deng dide bi-rayên xwe dibêje; zêr jî hene hebekî giran e, de ka min bikşînin jor. Birayê biçûk dikşînin bi jor de berî ji bîrê bê der, kêrekê didin werîs û werîs diqetînin. Mihemed dikeve, her cara tê xwarê li alîkî dîwarê bîrê dikeve û cardî dikeve hundurê bîra kûr. Lê bira ji keçikan re dibêjin; ji giranbûn werîs qetîya û Mihemed cardî kete bîrê. Çiqasî keçîka biçûk bangî Mihemed dike lê deng jê nayê, dibêjin; welehî çû mir û xwe ji ser bîrê didin alî.

Keçîk zane ku birê wî bêbextî lê kirine, lê tiştêk ji destê wê nayê ku bike. Keçîka biçûk ji xwe re dibêje; keçê rebenê bê aqilê, ma te çawa ew xortê ku tu azad kirîye di binê vê bîra bê îman de hişt. Çiqasî li xwe xistîye û kirye hawar, porê xwe kişandîye lê bêfêde ye.

Mihemed incex piştî sê rojan bi ser hişê xwe hatîye, nerîye ku hemû derê wî têşe, birîne hingî li kevrê derê bîrê ketîye. Rabûye hebekî xwarin xwarîye. Dîsa hatiye rastî devê bîrê bangî birayê xwe kirîye, tu deng his nekirîye. Qasî çend metra bi bîrê ve hijkişiyaye bi jor de, lê dîsa ketîye xwarê û tu mecal têde nemaye.

Nerîye ku hungulîska keçîkê di dest de ye, tiştê keçîkê jêre gotibû hatîye bîra wî. Çûye ber textê kalo nerîye ku li ber serê kalo qutîkek textîni û neqîşandî heye. Qutî vekirîye, nerîye ku bi rastî du perî têde hene; perîkî reş ê dî sipî ye. Weke keçîkê gotibû herdû perî li hev xistine, ji nişkê ve du beran derketine pêşberî

wî û pev ketine. Di ser serê hev re qulipîne, geh ê reş bûye spî, geh yê spî bûye yê reş; nema ji hev derxistiye bê yê spî kîjan bû. Gelekî bala xwe daye wan, bi kelecanaî dil xwe de xwe tavêje ser beranê spî lê dinere ku li ser beranê reş swar bûye û derneketiye ser rûwê erdê, bi heft tebeqê bin erdê de çûye.

Li xwe xistiye, giriyaye, ji xwe re gotiye: “Ev çilo wilo bû! Ev çawa bû û ez ê bi çi awayî derkevim ser gewrika dinyayê!” Tu çare û derfet jêre nema ji xeynî ku vê rewşê qebûl bike û pê razî bibe. Hebekî meşiyaye, gidî dinyak reş û bi xumam! Gihaye qiraxa gundeki, nerîye çend mal hene malê wan qet naşibihin malê ser rûyê erdê.

Xwe gihandiye xanîkî û li derî xistiye. Nerîye pîrik ixtiyar û porgij derketiye devê derî, di nav ax û teniyê de maye, xuyaye salekê xwe ne şuştîye. Pîrê gotiye; derbasî hundur bibe. Mihemed rûniştîye, pîrê jê pirsîye; lawo tu kîye, tu qet ne mirovê vê dinyê ye. Hebekî xwarin ji xort re tîne. Xort dibêje; ez gelekî tî bûme tu kare ji kerema xwe re hinek av bide min. Pîrê hinek av tîne, Mihemed avê veduxwe lê dinere genî û gelekî şor e. Avê ji devê xwe tavêje û dibêje; ev çîye xaltî. Pîrê dibêje: “Layê min, min ji fedîbuna re negot, ev heye heftak ava me tune. Ev ava min da te jî, min efû bike wele mîza min e.”

Xort sedema bê avbûnê dipirse; çima hûn bê av in. Pîrê dibêje: “Di welatê me de kanîyek avê heye, marekî zîhe xwe dixê devê kanîyê û nahêle av bê ji me re. Hercar em keçekê jêre dixemilînin û dibin heya keçikê dixwe av diherike, piştî keçik daqurtand dîsa qula avê digre.” Pîrê dom dike û dibê-

je: “Keçik di gundê me de nemane. Bi tenê keça paşayê vî welatî maye, wê sibe jêre bibin heya ku av ji me re berde.” Xort dibêje; ew cî li kûye, ez dixwazim herim wir, bibînim bê çawa keçikê dixwe.

Mihemed saloxa distîne û dire ferca keçikê, ka bê çawa didin mar. Keçik xemilandine, cil û bergê xweşik lê kirine; keçik ji bo mar amade ye. Ew wext tê ku keçikê bidin mar, Mihemed xwe bi pêş de diqedimîne û ji zilaman re dibêje; ka ez ê keçikê bidim devê mar.

Radihêje destê keçikê û bi alî mar de dibe, mar hebekî serê xwe derdixe Mihemed piçekî keçikê bi paş de dikşîne sere mar bi dûde tê Mihemed derbek şûr li serê mar dixîne û serê mar jê dibe. Keçik destekî xwe di xwîna mar dadike û li pişta Mihemed dixîne, dewsa tilîyê keçikê di nav pişta Mihemed de çêdibe. Piştî mar dimre av xurt dibe û her diherike mar û xwîna wî li ber xwe dibe, av paqij dibe; gundî jî bi kêf û şahî li rewşê temaşe dikin, ji bo ku îca wê ava wan hebe.

Mihemed vedigere mala pîrê, lê li gund şahî li dar e, gundî tev li kesra paşê xelasiya banûyê pîroz dikin. Paşe dibêje; kê ev mar kuştîye bela bê qesrê, ez ê wan xelat bikim û heger ku keça min jî bixwaze kare bibe zavayê min. Bangêrê paşê xwe berdide nav welat û dibêje; kê ev mar kuştîye bela bê qesra paşê, wê paşe wana xelat bike.

Çi xortê heye dibeze ber bi qesra paşê de û dibin rêz, çî xortê tê dikeve rêzê û dibêje; min mar kuştîye. Dinerin bi wî awayî çênabe, bangî keça paşê dikin da ku xort nas bike.

Banû tê li hemû xorta dinere û dibêje; wek ku ne ev in, xweş nayê bîra min, lê şûna destê min yê bi xwîna mar li pişta wî xortî heye, wan saxtî bikin hûn ê zanîbin bê kî ji wan e. Li pişta xortan dinerin tiştêkî nabînin û dibêjin; xuyaye yê ku mar kuştîye ne di nav van xorta de ye.

Îca paşe dibêje; herin li bajêr hemûyî bigerin, bela tu xort û zilam nemînin, tevda bînin vêderê. Zilamên paşê li bajêr hemûyî digerin û her kesî tînin, wan jî saxtî dikin lê şûna destê keçikê li pişta wan nabînin. Ji hev re dibêjin; ke-sek nemaye, ka em çawa bikin. Jinek ji dera han dibêje; pîrek heye mala wê hebekî li derî bajêr e, xortek li mala wê dimîne, dibe ku ew be.

Parêzvanê qesrê dirin mala pîrê, dinerin ku xortek li wir e, bi çeplê xort digrin û dibin qesrê. Dema keça paşê çav li xort dikeve di cî de Mihemed nas dike û ji bavê xwe re dibêje; ev xort bû ê ku min ji ber devê mar xelas kir û mar kuşt. Ji bo qenc jê amin bibin, li nav pişta Mihemed dinerin, dibînin ku şûna destê banûyê li nav pişta wî heye. Bi vî awayî dilê wan rehet dibe.

Paşe, xortê wêrek dibe qesra xwe û dibêje: “Ka bêje xortê delal, tu çi ji min dixwaze. Tu çi bixwaze ez ji bo te amade me, ji ber ku te keça min ji mar xelas kir û te derfeta ku em dîsa bigihin avê da me.” Xort gotîye: “Paşê min, ez ne ji vî welatî me. Mala min xwedîyên min hene. Ez naxwazim li vir bimînim. Keça te kare ji xwe re bi xortekî ji min hîn çêtir û baştir bizewice.”

Paşê gotîye; ma tu ji min çi dixwaze. Xort gotîye: “Heger derfeta te hebe tu karibe min bigihîne gewrika dinyê bes e, ez

ê gelekî dilxweş bibim. Ev daxwazîya min e.” Paşê gotîye: “Ez bi xwe nikarim lê teyreki sîmir heye, here wî teyrî bibine ew kare te bi gewrika dinye xîne. Heger teyr xweda ber te û çî xwest ez amade me ku her xwestekê teyr bi cîh bînim.”

Mihemed radibe li gora saloxa dire teyrê sîmir dibîne û derd û kulê xwe jêre dibêje. Teyr dibêje; rast e dema ez xort bûm quweta min hebû ez karîbûm biçim, lê neha ez ixtiyar bûme taqeta min ne weke demê berê ye, dibe ku ez bisernekevim.

Xort gelekî li ber digere û dibêje: “Ez ne ji van dera me, ez nikarim li vir bijîm. Tu çî bixwaze ez ê ji te re amade bikim.” Teyr dibêje; madem tu gelekî dixwaze ji min re heft teşt nan, heft kun av û heft goştê rehna werîn ez ê xwe biceribînim.

Mihemed dire ba paşê xwestekê teyrê sîmir dibêje. Paşê van xwestekan bi cîh tîne. Welhasil teyrê sîmir dibêje: “Va heman deyne ser piştta min û tu jî li navbera herdu baskê min siwarê. Her cara min teqlik da xwe tu kunek av, tenûrek nan û rehnekî goşt bavê devê min?”

Teyr şeş teqla li xwe dixwe lê di teqla dawî de ranekî goşt ji destê Mihemed dikeve. Mihemed bi şûrê xwe ranekî xwe jêdike û dawêje devê teyrê sîmir. Teyr fam dike ku ev ne goştê heywana ye, loma naxwe dixwe bin zimanê xwe. Piştî bi ser ronahîya dinê dikevin, teyr Mihemed dadixîne û dibêje; here bimeş. Mihemed dibêje; tu here ez ê dûra herim. Teyr rû lê datîne, Mihemed dema dixwaze bimeşe nikare bi nigekî bimeşe.

Teyr rehnê Mihemed ji bin zimanê xwe derdixe û bi tifa xwe pêve dicebirîne. Mihemed gelekî spasî teyrê sîmir dike

û bi rîya xwe de dimeşe. Piştire teyrê sîmir vedigere heft te-
beqê bin erdê ba zarokê xwe.

Mihemed dinere, piştî mirina wî kalê qamqut û rîhsipî bajar ji mirovan hatîye dagirtin, jiyana weke carzemanê berê dom kirîye. Mirov hemû ji jiyana xwe xweşnûd û bextewar in. Lê belê li bajêr, hengamak heye pir qebralix e, herkes dibeze bi vîyalî de û bi wiyalî de.

Mihemed li qiraxa bajêr dire mala pîrekê û ji pîrê dipirse; li vî bajarî çî qewimîye, ev çî dengê def û zirna ye. Pîrê dibêje: “Berî demekê kesek li vî bajarî tunebû, mirovan mal û mewdanê xwe hiştibûn û ev bajar terk kiribûn. Ji ber ku zilamekî gelekî biçûk lê bi erk ev bajar xistibû qelaqê. Dûra sê bira hatine vî bajarî, ew kalê qamqut kuştine. Di vê navê re birê biçûk jî hatîye kuştin. Ev deng, ev dengê def û zirne jî daweta birê mezin e, dike bizewice.”

Mihemed pirs dike bê ka bi kê re dizewice. Pîrê dibêje; birê mezin ji sê keçikê ku ji zilamê qamqut azad kiribûn, bi ya biçûk re dizewice. Mihemed dixwazê pîrê alîkarîyê bide Mihemed ku here ba dawetê. Lê pîrê dibêje; gelekî zor e herkesî naxin wan deran.

Mihemed hungulîska destê xwe derdixe û dide pîrê, dibêje; ji bo Xwedê here vê hungulîskê bide keçîka biçûk. Pîrê bi awayekî hungulîskê dide keçîka biçûk. Keçîk fam dike ku Mihemed sax e. Di dawî de Mihemed radije şûrê xwe û dikeve nav cihê dawetê, herdu birayê xwe dikuje. Radije dergistîya xwe û wî welatî terk dike, lê belê berî here layê pîrê dike mîrê wî bajarî.

LAWÊ ŞAREZE



Xortek ji gundekî serê çiya radibe dire bajarekî weke Qoserê an jî weke Nisêbîne, ji xwe re firoşgehekê vedike û bi sala kar dike. Bi demê re ji alîye derdorê ve pir tê naskirin û heskirin, xelk hemû gelekî pesnê wî didin ku nayê gotin. Zilamê ku ji gunda hatibû, her bi her îşê xwe mezin dike, li wî welatî zincîra dikana vedike û dibe maldarekî gelekî mezin. Ev rewş wilo dom dike heya ku navê wî li wê herêmê tevdfî bela dibe. Û ji ber vê sedemê mirov kare bibêje ku xelkê wê heremê, gelekî ji wî tucarî hez kirine.

Rojekê zilamê ku bi sala kar kiribû ji betilbûna nexweş dikeve û cîranê wî wî radikin nexweşxanê. Bijîşk difikirîn ku dema wî û jîyanê hindik maye.

Sê layê wî nî gihayî hene. Bangî hersî layê xwe dike û ji wan re diaxive. Dawî dibêje: “Ev maldarîya han min bi sala ava kirîye. Piştî ez mirim wê yek ji we têkeve dewsa min û dive ew kes bi zanabûn û aramî vî karî bidomîne. Îca wê kîjan ji we mafê vî karî bistîne, di destê we de ye. Ez ê şertekî bavê ber we, kî ji we biserkeve ew ê bibe mezinê vê malê û têkeve şûna min. Ez ê her yekî ji we lîreyekî bidim we û hûn ê herin bi vî lîreyî tişteki wilo bikin ku pê mezêlê min seranser tije bibe. Dûra karê kê hat ecibandin ewê bibe serekê vê pardarîyê.”

Hersî xort her yekî rahiştine lîreyê ku bavê wan daye wan û ketine ser rêya, çûne nava bajêr. Heya bûye êvar ve-gerîyane ba bavê xwe û xwestine bê çi kirine ji bavê xwe re pêşkeş bikin.

Bavê wan ji layê xwe nî mezin pirsîye û gotîye, ka te çi kir? Lawê wî yê mezin gotîye; ez çûmê welatê hevalê xwe û min ji wir du balye ka kirî. Û derdikeve derve radihêje herdu balyê kayê û tîne ber mezêlavê bavê xwe, balya vedike û hildiweşîne; kêliyên ewil mezêlavê dagirtin lê belê piştî çend demhûra ka hemû dadikeve ser erdê û bela dibe, dinerîn ku mezêlavê ma vala.

Zilam vê carê bangî layê xwe nî navê kiriye û ji wî jî pirsîye; ka lawo te çi kir? Xortê navê bersivê dide û dibêje; ez çûm bajêr, min jî du balgeh kirîn. Û radihêje herdu balgeha, vedike, perîyê di balgehan de derdikevin û difirin, li viyalî wiyalî bela dibin û dawî li erdê kom dibin; dîsa mezêlavê dagirtin.

Layê biçûk tê ba bavê xwe û dibêje; min jî bi perê xwe, şixatek û mûmek kirî. Radihêje şixatê, mûmê pêdixê; her derê mezêlavê bi şewqê tije dibe. Bavê wî gelekî dilxweş dibe bi vî karî û fêrî dike ku şarezatiya layê wî yê biçûk zêdetir e. Û ji layê xwe nî biçûk re dibêje; di pêşerojê de tê bibe serekê malbata me.

ÇÊLÎKA QULING



Gundekî li herema Mêrdînê ku bi bajarê Nisêbînê ve girêdayî ye, bûye warê vê çîroka Çêlîka Qulingê. Di demê buhurî de ji alîyê gelek mîrovên heremê jî hatîye vegotin. Xweş tê zanîn ku balindê quling balindekî koçber e, hersal ji demsala bîharê heya havînê ev balinde tên heremê û heya dawîya demsala havînê li heremê dimînin. Di nav zadan de hêlîna xwe çêdikin û hêkikê an jî du hêka datînin. Bi giştayî çêlîkek tê dinyê û heger tu kêşe neyên holê wê mezin bibe û bi diya xwe re dîsa vegere welatê berê yê ku jê hatine. Lê bi çî sedemê ye kes nizane, salekê balinda quling dereng maye, hêka xwe danîye û bi refê xwe re bi awayekî pir bi lez bere paş koçber bûye. Çimkî balindê koçber hersal demeke wan ya taybet heye, divê di wê demê de vegerin û bigihin cih. An na wê pir dereng bikevin û ji heval û hogêrên xwe bimînin.

Di wextê çinîna dexla de, çêlîka balinda quling tê dinê. Yekî gundîyê palevan li çêlîkê rast tê, lê xwedî derdikeve û tîne mala xwe, dixê hundirê qefesekê ji bo zarokê wan ji xwe re mezin bikin. Roj derbas dibin, çêlîk mezin dibe û nema di qefesê de hiltê. Ji bêçarebûn berdidin hewşê nav elok û mirîşka. Çêlîka quling di nav mirîşk û eloka de mezin dibe. Ji ber ku diya xwe ne dîtîye xwe elok an jî mirîşk dibîne û weke wan deng derdixîne. Û firandin jî nedîtîye

ku karibe bifire. Dem dizîvire û sal derbas dibe, dîsa dema hatina balendê qulinga yê ku bên heremê tê. Rojekê çêlîka quling derketîye ser dîwarê kozîdana tepîka, xweş tê dîtin ku bi bêrîkirinek giran û kûr li dûr dinêre. Mirovekî hebekî zana, ji wê çêlîkê fêrî dîke ku hisretek vê çêlîka quling heye.

Gundî lê rast hatine ku di wan rojan de refekî qulinga pir bilind di ser gund re firîyane û deng derxistine. Çêlîka qulinga ku di nav mirîşk û elokan de mezin bûye, ji xafil de ev dengê qulinga dibihîze; fikar û his kirîye “dibê ku ev deng dengê bav û bapîrê min bin”. Ew jî carekê weka wan dengekî bi tenê û bi şewatî derdixîne û ji ser dîwarê kozîdana sergîna tê xwarê. Çavê xwe digre û dikeve xeyalê ku bi refê xwe re difire, nigê xwe di ber xwe de radide, çend hêsirê çava digindirîne û dire ser dilovanîya xwe. Kesê ku ev çêlîk anîbû dinêre ku du hêsir ji çavê çêlîkê hatine xwarê. Maye ecêbmayî çawa çûkek kare bigrî. Dilê zilam pir şewitîye. Zilam li dervî gund tirbekê dikole û çêlîka qulingê dixê bin axê.

ÇÊLÎKA WERDEKÊ YA QEFÇÎL



Dê werdek bi sebat li benda şikestina hêkê xwe disekinî. Dema şikestina hêka hat, hêk yek bi yek dest bi şikestinê kirin û çêlikê werdekê yek bi yek ji hêka derketin derve. Lê belê hêka dawî û a herî mezin qet nedihat şikestin. Di dawî de qalîkê hêkê hat derizandin. Lê belê çêlika ku ji hêka mezin derdikeve tiştêkî cûda bû û ne dişibîya çêlikê ewilî. Dê werdek li çêlika xwe yî ku dawî hatîye dinê bi şiklekî behêti nerî. Dê werdek ji xwe re axivî û got; ez hêvîdarim ku ev çêlika min di pêşerojê de bê guhertin.

Dem derbas dibe lê rengê çêlikê hîn wek xwe gewr maye, tu guhertin çenebûye. Ajalê ku di koxikê de ne jî, bi tevayî henekê xwe bi çêlika mezin dikirin û pê dikenîyan. Û jêre digotin; çêlika qefçîl. Loma çêlika belengaz ne gelekî bextîyar bû û biryar da ku here warekî gelekî dûr. Serê sibehê rabû, ket ser riya û dest bi meşê kir. Wê rojê hemûyî meşîya heya ku lê bû şev lê belê gelekî betilîbû. Ji xwe re got; ez gelekî betilime, ezê hebekî bisekinim.

Ji alîkî tirs, ji alîkî din ve birçîbûn. Lê belê tiştêkî ku bike nemabû. Çêlika reben û belengaz ji betilbûna di wextêkî hindik de kete xewik giran û ket nav xeyalan. Piştî bû sibeh bi dengê avekê rabû, nerî ku li qeraxa çemekî mezin e. Fam kir ku refekî werdekan li qeraxa wî çemî şeva xwe

derbas kirine. Dixwest xwe bi wan hevalan re bide naskirin lê di wê demhûrê de dengê tivingekê hat û ji tirsarê re xwe ji wir da alî û revîya.

Hîn demeke dirêj derbas nebibû xwe di hewşekê de dît. Xwedîya hewşê pîrekîk pîr û kal bû, Xwedê jê razî be, çêlîka belengaz têr kir û av jî dayê. Çêlîka ku bi tena serê xwe maye dixwest golek avê bibîne û wir ji xwe re bike cîh û warekî nuh. Piştî riyek dûr ji xwe re golek dît û li wê derê dest bi jiyaneke nuh kir. Di vê navberê de, bi serê xwe tenê jiyaneke nuh nas dikir û dixwest fêr bibe. Lê belê roj derbas dibûn û pê nedihesîya ku kêsimê wê tê guhertin.

Rojek ji rojên ku nû bûye bihar, refêk qazquling hatine qiraxa wê golê û dixwazin ji xwe re hêlîna çêkin. Çêlîka reben li wan refê qaz û qulinga dinerî û axînek kûr dikişandin. Xwe wek yek ji wan didît. Ew refê qazqulinga bi aliyê çêlîkê de hatin, dixwestin xwe bidin nasîn. Lê belê ji ber ku hîn ji zarokîya xwe de, ajalê ku di koxîka diya wê de jê re gotibûn “çêlîka qefçîl” hîn xwe qefçîl didît û ji qazqulinga direvîya. Carekê li avê nerî û dit ku ew jî mezin bûye û bûye qazqulingekî gelekî xweşik. Di dawî de kete nav refê bav û bapîrê xwe.

Çêlîka reben û belengaz di dawî de, ketîye nav jiyaneke nuhhatî û heya dawîya temenê xwe, bextîyar û şad bûye.

GWÊŞİKÎ TIRÎ



Di demê buhurî de li hêla Mêrdînê, keça yekî maldar bi navê Gulbarîn hebû. Gulbarîn bi xweşikbûna xwe deng dabû wê heremê. Gulbarîn keçikek tenikî bejinzirav, çavên reş; dema cil û berg li xwe dikirin, kesê ku çav lê diket dibehetî û devê wan dima ji hev. Awirê Gulbarîn weke tîra dihat dilê xorta. Gulbarîn keça malbatê bi tenê bû. Bavê Gulbarîn gelekî hez ji keça xwe dikir, çî bixwesta bêyî ku yekê bike dudu tanî cih. Ji ber ku layê malê tunebû, Gulbarîn weke xorta mezin dikirin. Car caran li hespa siwar dibû dida cirîda, carna bi keçikê gundan re diket pêşbazîya û her gav bi ser diket. Car caran Gulbarîn bi xort û zilamê gundê bavê xwe re diçû nêçîrê jî.

Di bikaranîna şûra û kişandina tîr û kevanan de xwe bi pêş xistibû, karîbû bi xortan re têkeve pêşbazîya. Bi rastî di wê heremê de kesekî derfetek wisa ne dabûn keç û lawên xwe. Gulbarîn pir bi şens û siûd bû. Ji lewma nav û dengê Gulbarîn li heremê belav bibû. Bi vê sedemê xortê navê Gulbarîn dibihîstin dihatin ji xwe re dixwestin. Lê belê Gulbarîn tu kes nedieciband û tu carî ji tu kesî re ne digot erê.

Rojekê layê mezinê eşîrekê ku li heremê gelekî dihat nasînkirin û deng dabû, tê Gulbarîn dixwaze. Xort bi xwe gelekî çeleng û bejinzirav û xweşik bû, wekî din vî xortî

kesek di ser xwe re nedidît. Ji alîyekî din ve, xortekî gelekî bi fedî bû û li ber xwe ketî bû, loma di nav eşîra xwe de kesayetîyekî taybet û navdar bû. Çi fêde Gulbarîn ji vî xortî re jî nabêje erê.

Ev xort gelekî li ber xwe ketîye û ketîye nav xemgînîye-ke giran ku nema kare jê derkeve û ji fedîbûna re nema kare derkeve nava eşîra xwe. Wilo li ber xwe ketîye, bi vê wesilê jiyana wî hatiye guhertin û jiyana wî serobinî û tevlihev dibe. Ji qehra nava xwe, ji nav eşîra xwe derdikeve dire rojavayê Anatolîyê, derek weke Izmirê. Ji wê maldarîyê dire dibe feqîr û xerîbê welatê xwe.

Li wê dera dûr ji xwe re karekî digre û dest bi jîyanek nuh dike. Li gora xwe jinekê dibîne, dizewice, çend zarokê wî çêdibin. Lê weke bapîra gotîye “Şam şekir e lê welat jê şêrîntir e.” Xort çî dike çî nake nema kare debar bike, çimkî gelekî bêriya malbata xwe, welatê xwe dike. Di dawî de biryar dide ku di demeke kin de vegere welatê xwe.

Ew roj tê û berê xwe dide welatê xwe. Piştî rojekê tê gundê xwe û ba malbata xwe. Bi kêfxweşî û bi coşeke mezin ji alîyê malbata xwe ve tê pêşwazîkirin. Bi heval û hogirê xwe re rojin xweş derbas dike. Lê rojekê Gulbarîn tê bîra wî. Xort biryar dide ku here gundê Gulbarîn û lê bipirse gelo sax e, mirî ye, çî dike û bi yekî çawa re zewicîye. Rewşa wê pir meraq dike.

Ji derdorê li yekî ku Gulbarîn Xanim nas dikir rast hatîye. Xort ji wî zîlamê ku Gulbarîn nas dikir pirs dike û di-

bêje; madem tu Gulbarîn Xanim nas dike, ka bêje bê di çi rewşê de ye. Ew zilam bersiv dide û dibêje; Gulbarîn Xanim zewicîye. Li tarek bi navçeya Midyadê ve girêdayî ye dijî. Pir kêfa xort tê. Berê xwe dide tara ku Gulbarîn lê rûdinê.

Li gora navnîşana ku zilam dide, mala Gulbarîn dibîne. Lê pêşî mala wê dixê bin çawa û dişopîne. Meraqa xort ev e, dixwaze bibîne bê ka Gulbarîn bi zilamekî çawa re zewicîye. Li gor fikra xort divîbû Gulbarîn bi yekî ji wî hîn xweşiktir, bi aqiltir, maldar, xwedî xwe û kesayetîyekî di herêmê de gelekî naskirî be.

Lê dinere zilamekî qamqut, zik tellerî, ser peritî ji mala Gulbarîn derdikeve; xort dimîne behitî lê ji xwe re dibêje: “Dibe ku ne mêrê wê be, Gulbarîn ewqas xweşik, çawa dibe bi zilamekî wilo re bizewice.” Bi dilekî xemgîn û şikestî ev di serê wî re derbas dibin.

Piştî zilam dire, xort bi hêrs dire ber derî û çend cara li derî dixîne. Piştî çend demhûra derî vedibê, dinere Gulbarîn derdikeve devê derî lê ka ew xweşikbûn! Rûkî qermişî bi rewşek perîşan. Xort carek din pir xemgîn dibe. Xort gotîye; li min negire Gulbarîn Xanim û xwe bi naskirin dide. Xort dibêje: “Tê bîra te li vê herêmê gelek xortên çelenk û xweşik tevî min hatin tu xwestîn, lê te kesek ne eciband. Çawa dibe tu bi yekî wilo re zewicîye, çima, ji bo çi? Gulbarîn Xanim xort nas kirîye lê tiştêkî ku bêje nemaye, bi tenê gotîye: “Her nav van rezê derdorê ji min re gwêşikî tirî ê herî xweşik bîn, ez ê ji te re bêjim bê ka çima ez bi vî zilamî re zewicîme.”

Xort dire nav rezê derdorê li tirî dinere, dixwaze gweşîyê herî xweşik ji Gulbarîn re bibe; her li yekê dinere dibêje de ev gwêşî, de ev gwêşî xweşike û dike nake dilê wî lê rûnanê. Bi qasî seetekê derbas dibe, Gulbarîn dinere xort tê û di destê wî de gwêşîkî tirî heye lê hinek libê xirab tê de hene, lib çilmisî û ne weke dihat gotin ku gwêşîkî tirî ê herî baş û qenc e an xweşike. Gulbarîn gotîye: “Temaşe bike xortê delal! Min jî digot de ev xort de ev xort, lê min nerî ku ez ê di mala bavê xwe de pîr bibim û temenê min bi vî awayî wê derbas bibe; dawî ez ji neçarî bi vî zîlamî re zewicîm. Tê xuyakirin ku divê mirov bi yê di destê xwe de razîbe.”

GUR Û ÇEQEL



Rovîkî birçî ku li nav daristana ji bona xwarinekê bibîne digerîya, nerî ku gurek û çeçelek bi hev ketine, hevdû di nav xwînê de hiştine. Rovî temaşe kir û şopand, nerîye di navberê de, laşê kar xezalekê heye. Rovî fam kir ku herdûk li ser vî laşî pevketine. Rovîyê fenek rûniştîye û temaşa xwe dom kirîye, heya gur û çeçel di nav xwînê de bê taqet mane.

Rovî qenc fam kirîye ku gur û çeçel nema karin rabin ser xwe; rovî xwe berdaye holê, rahiştîye kar xezalê û bi bazdanek lotikî û bi kêfxweşî xwe ji wir bi dûr xistîye.

SÛCDARÎ



Ev çîrok di sala 1993yan de li Stenbolê di serê keçeke bi navê Daxwaz derbas dibe. Dibêjin, rojekê ji rojan Daxwaz ji zankoyê derdikeve û li rawestgehê li benda otobusê sekinîye. Lê belê wê rojê çî mixabin ku ji erd û ezman baran bariyaye. Di vê navberê de xortekî xweş çeleng û paqij girêdayî, bi ereba xwe li ber Daxwaz disekine, bi zimanekî xweş, nazik diaxive û dibêje: “Ez hêvîdarim ku ez şaş neyêm famkirin ji bo vê sekinandinê. Ji ber ku ez jî demekê wilo xwendekar bûm, ez ji vê rewşê pir fam dikim û ya rastî jî baran tê. Tu bixwazî ez karim te bibim heya cîhê ku tu bixwazî an jî cîhê ku tu herê.” Keçik cara ewil hebekî dudilî dibe lê li ber nêta xort a rastî pir şaş dimîne û dev lê tê girêdan. Loma tu xerabîyê nabîne û bi xort re li ereba wî swar dibe û dimeşin. Bi rê de bihevre bi dostayî û hevaltîkî pir nazik diaxivin û nimreya telefonê xwe didin hev. Heya demekî dirêj digihên ber derîyê Daxwaz, bi hêviya careke din hevdu bibînin xatir ji hev dixwazin.

Piştî xort ji devê derîyê Daxwaz vediqete, Daxwaz careke din ji alîyê paşve li xort dinere, xuyaye ku xort gelekî bandor lê kiriye. Çend hefte di navberê re derbas dibin û çavê Daxwaz li benda telefona xortê ku ew anîye malê. Her telefona wê lê dixîne dibêje ev xortê min e, lê çî fêde her car ne

ew e. Daxwaz biryarekê dide û dibêje: “Gerek ez li wî xortî bigerim, rewşa wî bipirsim û careke din spasî wî bikim. Çimkî mumkun e ku numra telefona min winda kiribe.”

Daxwaz telefon dike, lê dengê ku tê gûhê wê dengê jineke bi girîkî şewatî his dike û bi wî dengî re dimîne behetî. Meger ev dengê tê gûhê Daxwaz dengê dîya wî xortî ye. Daxwaz di telefonê de dibêje; xaltî tu kî ye û tu çima wilo bi şewatî digrî. Xaltî bi kelûgirî dibêje; layê min di qeza çarrê de çû ser dilovanîya xwe. Tu nabê piştî xort Daxwaz dibe malê, li veqerê qezê derbas dike. Daxwaz bi vê agahîyê pir xemgîn dibe, xwe sedama qeza wî xortî dibîne û dibêje; xwezî wî xortî ez nanîbama malê. Wilo dikeve bin bando-rekê ku hew karibe xwe jê xelas bike. Daxwaz navnîşana xaltî distîne û dixwaze serdanekê bide diya wî xortî.

Serdanî pir bi girî derbas dibe. Daxwaz berî ji xaltî veqete, tiştêkî layê wê jê dixwaze tiştêkî ku jêre weke bîranînekê bimîne. Xaltî gumlekekî lawê xwe dide Daxwaz. Daxwaz wî gumlekî tîne malê û ji xwe re hiltîne. Her serê çendakî ew gumlek derdixist, xortê delal bi bîr tanî, pêre diket xeyalan û her û her xwe sûcdar didît. Dema bêhna wê pir teng dibû seriyek dida diya lawik, bi himbêzkirina hev didan girî û dibû îskeîska wan. Bi demê re nêzîkayîk zêde di nav wan de çêbû, bûn wek dê û weledê hev. Daxwaz îca ji xaltî re digot yadê û ketibû şûna lawê wê, qet hevdu nema terk kirin. Çi ji wan dihat jihevve dikirin û bi wî hawî hebekî bêhna xwe derdixistin. Her ku diçû jihevve dibûn derman û roj bi roj li jiyana xwe ya rojane vedigeriyan.

EVÎNA GUL Û BILBIL

(Ji mîtolojîyên Mezra Botan)



Li gora lêkolînan û gotegota gelê ku di Rojhilata Navîn de dijîn, di derbarê gul û bilbilan de gelek çîrok û helbestên evînî dîtine. Ji van çîrokan hinek jê gelekî xembar, dilbiêş û bi hest in. Li gora herêma ku ez têde dijîm, di derbarê evîna gul û bilbilan de çîrok hatine dîtîn û di nav civakê de têne gotin. Yek ji wan wiha ye:

Bilbîlek ku dilê wî bi evîna xwezayê dagirtî, her roj bi fîra xweyî bilind li ser asîmana difîre, ji bona ku li jêra xwe temaşe bike û xwestinê xwe bi cîh bîne. Dema ku bilbil di fîra xwe de bi tiştê ku li jêr didîtin û dengê ku dihatin guh, bêhnê ku diketin pozê wî gelekî dilxweş dibû; bi van hestên xwe li ser zinara, li ser tehta bi dengê gelekî xweş kilam, stran û helbest ji derdora xwe re digotin.

Dîsa rojekê dema bilbil di fîra xwe de ye, li jêr bexçakî gula yî cuda dîtîye; pir xwestîye ku li nav wî bexçê gula deyne û li wan gulê rengareng binere. Lê ji nişkê ve çavê wî li guleke sor ketîye û çavê bilbil maye bi gula sor ve girêdayî. Maye di cihê xwe de sekinî, nema kare li dereke din binere û ne kare bi dereke din ve here. Mîrov kare bêje bilbil bûye evîndarê vê gulê, dilê wî bi yek carê re ketîye vê gula sor. Bilbil bûye dilevînekî mezin. Lê fam nedikir bê çîma û ji ku hat bi yekcarê re ev evînî, ji xwe re digot; çi cûdabûna vê

gulê ji gulê din heye ku bi hezaran û rengareng di nav bexçe de hene. Lê tiştêkî ku bilbil ji îca û pêde bike nemaye.

Bi rastî bilbil qet nedixwest hez ji gula bike, çimkî zanîbû wê demik bihata ku gul biçilmisîna û yek bi yek wê dev ji bilbil berdana. A duyem dirîyê gula hene pir dijwar in, ev dirî karin di kesê hez ji gula dikin rabin. Loma bilbil gerek neçûba derdora gulê, karîbû xwe bida alî. Bi rastî bilbil awirê xwe ji gulê dûr xistibû lê bilbil dîsa carek din nikarîbû li himberî dilê xwe nî biçûk û ji evîna gulê ku agir pêketî bihata. Bilbil rewşa ku ketibûyê tu mane nedidayê. Ji nav ewqas gulan çima ev gula sor ji xwe re hilbijartibû. Lê belê bêgûman divîbû sedemek jêre heba, gelo ev sedem evîna bû. Çimkî wê rojê heya êvarî li ser gula sor ketibû fikara, mabû xemgîn. Bi şev tu xew neket çavê bilbilê evîndar, dixwest zû bibe sibeh ku here gula xwe nî sor bibîne. Zanîbû, karîbû hew here serdana gulê lê dilê wî digot here carek din gula xwe bibîne.

A din î rojê çûye alîyê bexçe ku gula wî têde ye, ji dûr ve li gula sor xweş xweş temaşe kirîye. Îca ev gul mabû gula bilbil, çimkî nema dixwest ev gul bibe para tu kesî û tu diyaxa wî ji bo wilo jî tunebû. Karê bilbil mabû her roj here nav wî bexçî temaşe bike û bi şev jî diket xiyala gulê.

Bêgûman dixwest rojekê evîniya xwe ji gulê re bêje. Dibe ku gulê jî hez ji bilbil bikira û biba evîndara bilbil, di nav evîneke xweş de herdû bihevve şad û bextewar bibin. Fikara bilbil ew bû ku di şevên dirêj de, bi wî bedena xwe

nî biçûk gulê biparêze û himberî hemû xetera xwe bike sîper û çeper.

Bilbil mabû nezirkirinê gûlê. Bilbil ji bona gul bê av nemîne her roj ji ewrê ku baranê tine, ji bayê ku ewra ber bi hev tîne û ya herî pêwîst, ji bona gul bê qût nemîne ji axê re stran digotin. Heya ji ax û ba hat alîkarî dan gulê. Ji ber ku ew jî pir kêfa wan ji dengê bilbil re dihat. Yanî heyrana dengê bilbil bûn. Bêgûman ji xeynî strana pê ve tiştekan ji bilbil nedihat. Kesê ku bi gulê ve alîkar û eleqedar bûn, bilbil ji bo xatirê gula xwe ji wan re jî bi dengê xwenî xweş stranê evîni digotin.

Her ku dem bi pêş de diçû, bilbil hîn bêhtir bi gula xwe ve dihat girêdan û ne dixwest demhûrekê ji gula xwe dûr bimîne. Êşa hesretê, agir bi dilê bilbilê biçûk xistibû. Hejêkirina ji dûrayî ve şevta dilê bilbil sar nedikir. Dixwest pir nêzî gula xwe be, li ser şaxê têde deyne û jê re dengbêjîyê bike. Xof û taswasîya di dilê bilbil de mezin dibûn. Gelo ev evîna bilbil wê bersivê bistîne. Lê di navberê de tiştekan rastîn û heqîqet hebû. Çiqasî bilbil evîndarê gulê be jî, gul ji vê evîne bêxeber bû.

Bilbil rojekê wêrebûna xwe anî xwe û ji stirîyê darê bê tirs çû ser şaxê ku gula wî têde danî. Dîvîbû biaxive û kela nava xwe ji gula xwe re bîne der. Heya jê hat bi dengê xwenî xweş bi awayekî bilind evîna xwe ji gula xwe re da der. Dengê bilbil hîvqasî xweş bû, ji nav gula ya herî xweşik û nazdar, beramberî evîna bilbil bê deng nema. Yanî gulê bi

evînî bersiva bilbil da û di dawî de xiyalê herdûka hatin cî û bûn evîndarê hev.

Bilbil û gula wî her roj demê xwe hemû bihevre derbas dikirin. Lê ji bo ku bilbil ew ji dengê xwe nî xweş bêpar hiştibûn, gulê din yê di nav bexçe de çavreşî avêtin gula sor. Çîmkî bilbil stranê xwe bi tenê ji bo gula sor digotin. Di dawî de dinya hemû li dijî vê evînê îttifaq danîn û berê xwe ji wan guhertin. Divîbû bilbil bê ser riya rast û dîsa stranê xwe ji bo hemû gula bêje, ne bi tenê ji bo gula sor. Lê bilbil ji vê buyerê ne agahdar bû. Çavê wî ji gula wî û pêve tu tişt-tekî din nedidît. Ji lewma ferq nedikir ku dost û hevalê wî jê keyidîne û berê xwe jê guhertine bi alîkî din ve.

Ewqasî kor bibû ku nedidît temenê gula gelekî kin e. Roj bi roj pelê gulê diçilmisîn, lê belê bilbil tu mane û wate nedida vê rewşê. Tu tiştê ji destê bilbil nedihat û ya xerab li ber çavê bilbil ev çilmisandin pêk dihat. A rastî, bi vê evîna mezin çilmisandina gula ji bîr kirîbû. Bilbil bixwe ji bo vê êşe ne amade bû. Sedema hejêkirina gula ji bîr kirîbû. Dihât dîtîn ku erka evîna gula sor, ev bi bilbil jibîrkin dabû.

Çi fêde, di demeke kin de gula wî bi tevahî çilmisî û çû. Bilbil ne tenê evîndarê xweşikiyê Gula sor bû, wî tev dirîyê wê jê hez kiribû. Bilbil bi girî û bi hesirên çavan tevî dirîyê tûj gula xwe cara dawî himbêz kir û ne dixwest ji destê xwe berde. Bilbil heya gula sor nedîtibû hez ji gula nedikir ji ber ku strî û dirîyê gula hebûn, lê vê carê di nav êşik mezin de çavê bilbil strî nedidîtîn û gula xwe bi awayekî erkî himbêz

dikir. Lê çî fêde ew dirî û strîyê gulê ên tûj weke xincera di bedena bilbilê biçûk radibûn. Evîndarîya bilbil wilo hişê bilbil biribû ku xwîna ji dilê wî diniqutî ser erdê nedidît. Û tu êş hîs nedikir û ne dixwest gula xwe ji himbêza xwe berde. Piştî ku gula wî ne li cem be çî pêwîstî bi xûnê heye. Bilbil ji îca û pêde hew ji mirinê ditirsîya. Bilbil nefesa xwenî dawî dida. Cara dawî xwe di ber gula xwe nî bê can û ruh re dirêj kir û hêdî hêdî çave wî dihatin girtin. Gava çavên wî bi tevahî hatin girtin, ji bo vê evîna mezin û giran ne poşman bû. Gul û bilbil îca bê ruh û bê can man. Lê belê ev evînî û eşqa mezin, bi sed salan di nav civaka de nehat jibîrkirin. Xweşikbûna gulê û dengê bilbil bûn efsane. Ev efsane bû numûnek ji evîndaran re.

KEÇA MÎR



Hebû tunebû, tişt ji Xwedê mezintir tunebû. Welatekî pir mezin û fireh hebû. Gelek cîh û warê vî velatî hebûn, dawîbûn jê re tunebû. Lê çî fêde qîza mîrê vi welatî bê saadet û kef bû, roj bi roj keça mîr zeîf dibû û ber bi nexweşiyê de diçû. Rojekê mîr bang keça xwe kir û jê re got; bêja keça min î delal, çî derdê te heye, tu xwediyê vî welatê fireh û hemû îmkânê te henin, bêje min ez cihanê ji bo te xera bikim, ava bikim.

Mîr çîqas xwarina xweş û fêkîyê li cihanê hene anîn ji keça xwe re, keça wî kefa wê nehat cih. Mîr keça xwe şand ba apê wê, li diyarekî gelekî dûr, aliyê wiyalî cîhanê. Keça mîr li ba apê xwe jî dilxweşî nedit. Ji bo vê yekê qîzîk ji apê xwe re got; apo min bişin bal bavê min, dîsa ez gelekî aciz bûme. Apê we keçîk neşand, dixwest li bal wî bimine. Piştî wê rojê keçîk ji ba apê xwe reviya û berê xwe da çol û çiya.

Keçkê rîya xwe şaş kir û di daristaneke mezin de winda bû. Berê xwe da riyekê ku nizanîbû bi ku de diçe û dîsa dest bi meşê kir. Li keça darbir a biçûk rast hat. Keçîkê berê xwe da banûyê û jê re got; tu kîye û li vê daristanê li çî xwe digere. Banûyê girye xwe qut kir û got; ez keça mîrê mezinim. Dûra keça darbir ji xwe re got; keça mîrê mezin li daristanê çî îşê wê heye. Keça mîr got; ez li seraya bavê xwe pir ne

dilxweş bûm, ji bo wilo ez reviyam û dûra ez winda bûm. Lê niha ez gelekî ditirsim.

Keça darbir got; tu bixwazî tu karî bi min re bê mala me yî ji dara ya ku li daristanê ye. Kêfa keça mîr hat û pêre çû mala van. Diya wê keçkê ji van re xwarin çêkir. Piştî têt bûn herdu keçik li hundirê wan geriyan. Çaxê ketin odeya keça darbir, banû ji çavê xwe yeqîn nekir, ji ber ku oda qîza darbir tije pirtûk bûn, hemû berhemên gelek baş û klasîk bûn. Banû keça mîr û paşa bû, lê li oda wê pirtûkê wilo gelek tunebûn. Ji keça darbir re got; gelo ez ji van pirtûkên te karim rahjim yekî û lê binerim. Keça darbir rahijt pirtûkekê, da keça mîr û got; bela ev pirtûk ji te re be. Piştî banû pirtûk xwend û dit ku heya niha tiştê ku jê re bi xelatî anîbûn hemû bihevne ne wek wê pirtûkê bûn. Acizbûna wêna hemû, ji ber ku heya niha pirtûkê wêna yê wilo tunebûn.

Piştî çend rojan darbir bi destê banûyê girt û bir seraya bavê wê. Piştî mîr qîza xwe dît, pir kefa wî hat. Xelateke mezin da darbirê daristanê. Piştî çend meh derbas dibin, mîr dîtîye ku keça wî bi ser xwe hatiye û pir dilxweş e. Jê pirsîye; keça min heya niha çi derdê te hebû wilo tu bêtê bû. Qîza wî bersiv daye û gotîye; heya niha min nizanîbû ku pirtûk wilo qenc in û kêfa min ji wan re têt. Piştî mîr ev agahî ji keça xwe bihîstîye gelek pirtûk anîne û pirtûkxanekî mezin vekirîye, ji bo ku keça wî heyâ mirinê demê xwe bi xwendina pirtûka derbas bike û hezkirina pirtûka bide derdora xwe.

ŞIVANEKÎ PÊŞVERÛ



Gundek li herema bakurê Kurdistan li ber çemekî mezin weke Firat an jî Dîcle hatîye avakirin hebû û ev gund gundekî dîrokî bû. Lê belê di vî gundî re tu rê derbas nabin û ji heyaman ve bê rê ye. Qehwe, nexweşxane, xwendegeh jî lê tune. Lê xweza ji kerema xwe re cîhekî şêrîn daye wî gundî. Di nav hêşnahîya de û di ber gund re aveke zelal û weke qeşa bi nalîn diherike.

Ev gund û gundê derdorê jiyana xwe bi xwedîkirina ajalan derbas dikin. Di vî gundî de, şivanekî bi serê xwe, bê kes û kûs jiyana xwe didomand. Ev şivan di nav gundê xwe û gundê derdorê de jî dihat hezkirin û xweşnaskirin, çima, ji ber ku pir şuxulker û alîkarxwaz bû. Bi qencbûnê xwe bibû xwedî cîhekî taybet. Û di wê heremê de kesekî mîna wî nizanîbû li bilûrê xîne.

Jî alîyekî din ve kesek mîna wî nikarîbû şivantîyê bike û jixwe şivaneke din jî li wê heremê tunebû. Em karin bibêjin, bi tenê ev şivan şivanê wê heremê tevdî bû. Şivanê heremê ne bitenê li ber mîh û bizina bû, hemû ajal di nav kerîyê wî de hebûn; mîna hêstira, hesp û gamêşa...

Ji bona ku bi salan li çola şivantî kirîbû û bi salan bi serê xwe tenê mabû, ji neçarî û bêçarebûn serê xwe şuxulandibû.

Û ku bi ser tiştêkî vedibû te digot belkî wî nûvedaye, çimkî wî berê tu tişt nedîtibû. Ev tiştê ku wî li gora xwe nû vedida ji xwe re dikir xelatekî mezin. Û ev şivan rojekê bi tenê neçûbû xwendegehê, lê belê bi hemû awayî xwe li ser xwendin û nivîsê fêr kiribû. Ji ber vî awayî çî nivîs û resîmê dîrokî ku li çolê lê rast dihat bi zanîbûna xwe ji nav hev derdixist. Û di derbarê va resîman û tiştên bi nivîsên dîrokî de agahî tanîn holê. Ji ber vê sedemê gelê heremê şivanê gundê xwe li nav mîrova bê gûman weke şivanekî pêşverû dabûn nasîn.

Ji alîyekî din ve şivan, ji alîyê hunerê jî xwe pir bi pêşxistibû, çimkî ji gundîyê xwe re û hemû gundê derdora xwe re mîna sobeyan, halet, gîsin çêdikirin. Çî hewcebûna gundîya heba ji gundîyan re tanî cih. Ji bo wê yekê, tûrikê wî tije hacetê ji bona nûvedan û alîkariya mîrova bûn. Çaxa şivan li çîya li ber pez dima, sehê wî Bozo alîkariya wî dikir, hin îşê wî ji alîyê Bozo ve dihat bicîhkirin.

Bozo hevalekî şivan î pir dilsoz bû. Ji bona parîkî nan ewqas çîya ji serî heya binî li hev dixist. Bozo cewrikekî pir biçûk bû dema ji alîyê malbatekê ku pezê xwe ji herêma Serhedê anîbûn alîyê Botan û çaxa li Serhedan vedigerin wî li herêma Botan dihêlin. Dûra ji alîyê şivan ve tê xwedîkirin, piştî demin dirêj mezin dibe û dibe Bozo. Bozo kûçikek pir zîrek e. Û mîrov kare bibêje ji bo şivan destê rastê ye. Çaxa şivan li çîya li nûvedana bigerîya Bozo dibû şivanekî rast û bê kêmasî. Bozo wilo kûçikekî bi hêz bû karîbû hirçekî bavêje ser erdê.

Şivanê pêşverû, rojekê ji rojan dîsa pezê xwe bera dora herêma xwe dide û li çolê dest bi nûvedana dike. Piştî çend seetan, nivîsekê li serê zinarekî şahîk û gelekî asê dibîne û heya hildikişe ser wî latê bilind, gelekî zehmetiya dikşîne. Bi cara yekem re hişê şivan dimîne ser wê nivîsê, ev helbest bi nivîseke rast li ser latê fireh hatiye kolandin. Bi rojan li ser vê nivîsê kar dike. Nivîs xuyaye ku nivîseke gelekî dîrokî û kevn e. Û tê dîtîn ku ev nivîs gelek çanda vedihewîne. Lê belê çend rojên direj li ser dixebite û wê nivîse bi rewşeke pir zehmet ji hev derdixîne. Dinere, ew nivîsa ku dîtîbû helbesteke wêjeyî ye; xuyaye destpêka helbestê wilo tê dîtîn. Destpêka helbestê ji van rêza pêk hatiye:

EZ SÎMÛRG IM

Ez sîmûrg im

Balindekî zana me

Ez ji demê buhurî tîm

Difirime pêşerojê

Babilê

Û baxê Semîramîsê

Bi dîtinekî pîralî derbas bûme

Û min gelek av

Ji Firat û Dicle

Vexwarîye

Min bêhna xwe li Nînova stendiye

Heta min got

Ji jora Mezra Botan
Min li Heranê bêhna xwe daye
Min ji warê Xelîl Brahîm
Li Nemrûtê temaşe kirîye
Meger dahatûya min
Di paşeroja min de veşartîye

Piştî jihevderxistin û xwendina vê helbestê, şivan mane-ya helbestê hemû fam kirîye, lê belê çaxa ku helbest xwendîye xwe di naveroka helbestê de dîtîye û bi wan demên dirêj, bi deng û dîmenê wan çaxan re rû bi rû hatîye. Wek mînak, bi balindê sîmûrg re firîyaye û bi hezaran çandê cuda cuda temaşe kirîye û bûye şahidê bi hazaran şer û di wan şeran de bi hazaran mîrî û birîndaran. Dengê tîr û kevana, şinge şinga şûr û mertalan maye li ber guhê şivanê pêşketî, ev deng û dîmenê xedar bûye sedema girî û qêrîn û bêxewbûna şivanê pêşverû; bi şev û rojan û mehan bê dawîbûn ev rewş dom kirîye.

Li gora şivanê pêşketî ev demên tişê elem û keder ku ji aliyê balindê sîmûrg ve bi fîra xwe yî ji salên dûdirêj yê derbasbûyî anîye heya îro an jî rojeva me, dibe ku bi awayekî bibe bi dawîbûn. Dîsa li gora şivanê pêşketî dibe ku sîmûrg bi pêşerojê ve karibe dîsa bifire û ev firandina sîmûrg bi helbesteke nû be li cem helbesta yekem a dîrokî ku li ser latê, ji kevn ve hatibû nivîsandin. Şivan kar û barê rêzê nû kirîye û li ser latê wiha kolaye:

SÎMÛRGIM

Ez sîmûrg im
Balindekî dîrokî me
Digerim weke gerdûn
Li ser hemû parzemîna
Dinerim li hemû rewş û dîmena
Naxwazim îca û pêdê bibînim
Şer û mirina mîrova
Heya dinya hebe
Ezê bifirim bi va
Bask û perîya
Li her derî perîkî sipî deynim
Ji bo bibe sedema aşitî û hevaltîya

Çaxa şivanê pêşketî ev rîzên hana yê ji bo firandina sîmûrg bi pêşerojê de rîz kirine, dilê wî ji pêşerojê re pir bi hêvî bû. Ji alîkî din ve nedixwest dest ji şivantîya xwe nî ku gelekî jê hez dikir berde. Bi rojan li ser vê mijarê difikire. Di dawî de biryarekê dide û dixwaze dîsa weke her car şivantîya xwe dom bike.

Serê sibehekê ajalê xwe derxist dora gund ji bo çêrê, lê belê di ser û ramanê wî de balindê sîmûrg hebû. Çimkî ji bo şivan, balindê sîmûrg bibû hêviya xelasbûn û pêşketina dinyayê. Em karin bibejin, çiqas sîmûrg ji bo şivan qehremanekî rawejîbe jî, şivan dixwest balindê sîmûrg di jîyana xwe de carekê bibîne. Lê belê ev daxwaz ne hîvqas rehet bû.

Çimkî balindê sîmûrg balindeki dîrokî û qehramanê rawejî be jî sîmûrg qehramanekî mîtolojîk e û em çiqas bêjin wê ev distûr wilo bimîne.

Ji alîyê şivanê pêşverû ve qenc hat fêmkirin ku temenê wî wilo wê di şivantîyê de derbas bibe. Lê belê dixwest hêvîyên wî bibe daxwaza gelê ku di nav de dijî û gelek gelên din yên ku li dinyayê dijîn. Rojên wî di van fikaran de derbas dibû.

Lê rojekê fêm kir ku ji kerîyê pezê wî mîh an jî bizin hindik hindik kêm dibin. Pir xem dixwarin, dixwest zanibe bê sedema vê çî ye. Rojekê bi şev xwest şiyar bimîne û bibîne bê çî diqewime. Piştî nivê şevê ji kaşekî çend zûrandina gurekî hat gûhê şivan. Şivan nerî ku kûçikê wî Bozo yê ku alîkarê wî nî qenc û dilsoz bû, zûrîya û bersiv da gur. Piştî çend demhûra nerî ku Bozo ket hefşîkê pez û bi stûyê miha herî qenc girt, ji hefşîk derxist û da ser rîya kaşa, bir radestî gur kir. Şivan ji alîyekî de pir xemgîn dibe, çimkî sehê wî bêbextî lê kirîye û ji alîyê din ve jî pir kêfxweş dibe. Em bêjin çima! Çimkî daxwazîya şivanê pêşketî jî ew bû ku di pêşerojê de yekî weke gurekî bêbext û fennok bi kûçikan re bibe heval. Daxwaz û hêvîya şivan jî ew bû ku ev mijar bibe nimûnek ji gelan re. Dibe ku ev mijar dîrok jî nenivîse lê belê şivan ji lewma balindê sîmûrg bi helbesta xwe nî nû bi pêşerojê de firandibû.

ŞÊR, GUR Û ROVÎ



Bi tevahî şêr ajalekî gelekî bi erk e û xwe gelekî wêrek û cesûr dibine. Wekî din ji hemû alî ve bahwerîya wî bi wî heye, yanî li xwe amin e. Kare zora hemû heywanên ku jê biçuktir hene bibe. Nakeve şerê ajalên ku jê mezintirin. Lê belê xwezayî bi wê fizîka xwê ya bi heybet tirsî di yê miqabil xwe de difirîne, lewma şêr herdem xwe mîrê daristana dîtîye û ev nasnav sitendîye. Bi rastî şêr heywanek weqar e, têkeve çî pevçûnê bi ser dikeve, ne durû ye bi hişkere dire ser nêçîra xwe. Her li gora navê xwe tevdigere û nakeve xetera, ji ber ku şaşitîyekê bike nema veger tê heye û bi vê dibe ku navnasîya wî bê perekî.

Lê belê gur ne hivqasî weke şêr wêrek û merd e û ne tu mîr e jî. Weke şêr tu erkbûna wî jî tune ye. Gur bi xwe ajalekî mixenet e. Bi rastî gur tam gur e. Herdem li ku be gurîtîya xwe dike. Li ber a xwe ye, dema nêçîra xwe zeîf dibine êrîş dike. Rovî jî gelekî qurnaz e û ji ajala hema fenektir e. Ji alîkî din ve, rovî xweş şelaq û şelafî jî pêre heye. Ji alîkî din ve herdem kare planên mixenetî bike û dike. Bi xwe bi dû efara laşa de ye. Bi xweşî, tiştê ku ji ber ajalin jê hîn mezintir dimîne dixwe. Yanî zane baş paqijiyê bike. Li vê gorê çîrokek va hersê ajala bihev re heye. Lê belê ker jî bi wan re dibe heval.

Rojekê ji rojan çawa dibe ev herçar ajal bihevre dibin heval û bihevre rêwîtiyê dikin. Demsala çele ye, dinya sar e, hemû der qeşa girtîye, ba û baran bihevre tê. Derik ku xwe tê de bisitirînin tune. Nema zanin bê wê çawa bikin. Lê hebekî ji dûrayî ve daristanek xuyaye. Şêr û gur dibêjin; ka em herin nav daristana, dibe ku şikevtin hebin em têkevinê heya bê ev hewa sar çawa dibe.

Dimeşin, xwe bi nav daristana digihînin. Lê ji nişkê ve herçar dişemitin û dikevin hundurê çaleke kûr. Dibînin binê çalê fireh e, dirin ber bi firehiya çalê de, pir kêfa wan tê ji ber ku li ber sermayê nemane. Dûra çiqasî dikin nakin nikarin derkevin, dibêjin; ka em ê herin ser piştta hev, dibe em bigihên devê çalê. Çi fêde ew rê jî ji wan re pêk nayê.

Çend roj derbas dibin, hemû birçî dibin. Nema karin ji birçîbûna tevbilivin. Şêr bangî rovî û gur dike, bihevre diaxivin. Şêr dibêje; dibe ku em ji nêza bimrin divê em çarekê bibînin. Rovî ditirse û ji xwe re dibêje; ev herdu bi erk û ji min mezintir in, karin bi zorê min bixun, ez ê çawa bikim û difikire. Lê şêr dibêje; niha vê derê gelekî teng e û ker gelekî cîh digre, ku em wî bikujin heya mehekê wê têra me bike, dibe heya wê demê em ji vir derkevin. Şêr çav dike gur, weke bêje kerê bikuje. Gur ji nişkê ve xwe çem stûyê kerê dike û dixeniqîne. Şêr ji gur re dibêje; ka te ker kuşt tu kare goştê kerê li me parve bike. Gur dibêje; bela ser çavan mîrê min.

Dest bi belakirina goşt dike; dera bi goştê xweş ji xwe re dide alîkî, hestiyê mezin û serê kerê dide şêr. Hestiyên

biçûk û rovîyan dide rovî. Şêr bi awirin ne baş li gur dinere û dibêje; ev çi parvekirine gur efendî! Gur dibêje; mîrê min, tu ji me mezintir e ji lewma min ev perçê mezin hemû ji te veqetand. Şêr pir diqehere û lepekî bi nigê xwe nî pêş li nav sikûmê gur dixîne û davêje nav herrîya binê çalê. Çilekiya gur bû sedema dawîbûna jiyana wî.

Îca şêr dibêje; rovî beg, ka tu hemî li me parveke. Rovî bê his û deng dest bi parvekirina laşa dike. Hemû qismê goşt dide şêr û ji xwe re bi tenê hestî dane alîkî. Di vê navê re, rovî ji xwe re qulek bi qasî ku ew têkevê kolaye û bi qasî metrekê kûr kirîye. Şêr ji rovî re gotîye; rovî beg te ev parvekirina bi edalet û wekhevî çawa bi cîh anîye. Rovî gotîye; mîrê min ji terîya repî ku di nav herrîyê de çikilîbû. Rovî ji tîrsa re ketîye qula xwe û çûye heya dawîya qulê.

Şêr bi roja goştê xwe xwarîye. Lê belê rojek hatîye ku goştê şêr xelas bûye. Şêr bi rojan birçî maye, lê rovî hestîyê xwe hêdî hêdî dikirkitîne. Şêr bangî rovî kirîye; hevalê rovî ka tu çi dikî were derkeve ji qulê, min bêrîya te kirîye. Rovî dibêje; mîrê min ez hestîkê xwe dixum, ez nikarim derkevîm. Şêr çiqasî lepê xwe davêje qulê lê nagihe heya rovî.

Şêr gelekî birçî bûye. Dîsa bangî rovî dike dibêje; ka tu çi dikî, çima deng ji te nayê, ez xema te dixum, rewşa te çawa ye. Rovî deng derdixe û dibêje; hestîyên min qedîyanê, ez çavekî xwe dixum. Şêr herdu çavê xwe xwarine. Dûra dîsa şêr birçî dibe, carek din li rovî vedigere. Rovî dibêje; ez nigekî xwe dixum. Şêr jî ji birçîbûna dest bi xwarina nigekî

xwe kirîye... Bi vî awayî, rovîyê fennek dike ku şêr çar nigê xwe bixwe. Şêr maye bê nig û bê çav, yanî bûye tiştêkî girover, bûye wek gundorekî, nema kare bilebite.

Rovî ji qulê derdikeve, çi binere! Mîrê daristana ketîye çi halî! Rovî li xwe dixwe û dest bi girî dike, dibêje; mala min xera bû, mîrê min ketîye çi halî, ez ê çawa bikim. Lê fenneko li dor şêr dire û tê. Ji nişkê ve xwe davêje û li ser piştê siwar dibe, devê xwe davêje qirka şêr û reha qirikê diqetîne. Şêr dimire. Rovî dikeve ser laşê şêr û dest bi xwarinê dike.

Rojekê baranek tê weke ku ji ezmana bi sîtila tu avê berde ser ruyê erdê. Av diherike, lehî radibin. Çala ku rovî têde hin bi hin tişê av dibe û bi vî hawayî rovî li ser avê dimîne heya ku ji çalê tê der. Rovî digihe azadiya xwe. Her çiqasî şêr mîrê daristana be jî, rovî bi aqil û fennekbûna xwe, xwe xelas dike.

DERMANÊ ÊŞÊ



Jinikek û layê xwe, bi tenê li herêmekê dijîyan. Piştî çend sala layê jinikê bi êşa zirav dikeve û dire ser dilovanîya xwe. Jinik ewqasî dilê wê têşe û êşeke wilo dijwar dibîne ku bi şeva û bi roja hew radizê û layê wê ji bîra wê nare. Jinik biryarekê dide û dixwaze here bal zilamekî oldar û derdê xwe jê re bêje, dibe ku jêre çarekê bibîne.

Jinik dikeve ser rîya, bi roja û bi şeva dimeşe, piştî demekî dirêj oldarekî bi nav û deng dibîne û dire mala wî. Jê re dibêje; hal û mesela min wilo ye, ez ketim bextê te û bextê Xwedê, tu karibe ji min re çarekê bibîne. Ê oldar pir bi tecrûbe û zana ye û naxwaze piştî guhdarîya jinikê kirîye rabe çend şîreta lê bike û bi paş de bîşîne. Ê oldar difikire ku a qeç ew e, rêkê baş şanî wê bike. Ji jinikê re dibêje; here ba mala mirovin wilo ku qet êş nedîtîbin û ji bexçê wana bizrê xerdelê werîne ez ê ji te re bikim derman, ew ê bibe sedem ji te re ku tu êşa layê xwe ji bîra bike.

Jinik radibe ser xwe, dikeve ser rîya û mal bi mal digere. Li ser rêgehekê maleke wilo mezin weke wargehekê dibîne, li derî dixîne û ji xwedîyê malê dipirse; gelo dibe ku we di jiyana xwe de qet êşek nedîtibe. Xwedîyê malê jinikê derbasî hundur dikîn û jê dipirsin; gelo ev derdê te yî wilo mezin çiyê. Jinik derdê xwe ji wan re dibêje. Xwedîyê wargehê

bersiv didin û dibêjin; ma ev jî derd e. Xwedîyê wargehê jî, derd û kul û kederê xwe ji jinikê re dibêjin. Jinik dibîne ku derde wan mîrovan ji ê wê pir gelectir û mezintir in. Jinik ji wargehê derdikeve û disa li gera xwe nî ji bo mîrovên bê êş didomîne. Bi meha û bi sala digere kesekî bê êş nabîne. Çiqas mîrovên ku ji wan pirs kirîye, êş ji êşê mezintir bihîstîye û rojek hatîye ku jinik bi xwe ji derdê mîrovan re çarekê bibîne û alîkarîkê bi wan mirovan bike. Di vê navberê de sal derbas dibin. Jinikê di vê gera xwe yî ji bo bizrê xerdelî de wilo mirovên bi êş dîtine ku nayên hejmar. Rojek tê jinik xwe ji bîr dike û layê wê hew tê bîra wê û ew êşa xedar ji nava wê tê der.

ÇÎROKA XORTEKÎ BIJÎJK



Xortekî Kurd ji Kurdîstana Rojava, ji bajarê Qamişlo ji ber şer koçberî Ingîlîstanê dibe, li bajarê Londonê dest bi fêrbûna zimanê Ingîlîzî dike. Paşre xwe li zanîngehê qeyd dike û dest bi xwendina beşa bijîjkîyê dike. Piştî qedandina zanîngehê xortê Kurd li Londonê dimîne û di nexweşxanekê de dest bi kar dike. Li gora ku xort agahdar bûye, xortekî Hindî jî weke wî ji welatê xwe koçber bûye, ew jî hatiye Londonê zanîngeh qedandîye û ew jî di vê nexweşxanê de kar dike.

Mîna her bijîjkî ji mehê carekê bi şev di nexweşxanê de nobedar dimînin. Dora nobedariyê hatiye xortê Kurd. Lê belê karekî wî yê din ku gelekî girîng e li derve heye, dire ba xortê Hindî jê re dibêje; divê ez îşev li mal bimînim, gelo tu kare îşev ji bedêla min ve li nexweşxanê bibe nobedar. Xortê Hindî dibêje ser çava, ez karim. Xortê Kurd gelekî sipasî yê Hindî dike û dibêje: “Tu mirovekî gelekî qenc e, çima gelo? A duyem weke min bihîstîye û li gora bala min dikşîne, gelek kesê bijîjk û kesên ku di vê nexweşxanê de kar dikin hemû hez ji te dikin.” Xortê Hindî bersiv dide û dibêje: “Rojekê dema ez derdora heft salî bûm, li gundê me ez û diya min em çûbûn êzinga. Diya min ji min re got; here serê vî zinarî û bangî aliyê newalê bike û bêje ez hez ji te di-

kim. Weke diya min got, ez çûm ser zinar û bi dengê bilind min got, ez hez ji te dikim! Piştî çend demhûra di newalê de dengvedanek çêbû, got; ez ji te hez dikim. Diya min got; te bihîst ji te re got ez ji te hez dikim. Yanî ji wê demê û pêde min xwe guherand û min ji herkesî re got, ez ji te hez dikim. Ev heskirin li min vedigere.”

TÛRKÊ KERENGA



Li bakurê Kurdîstanê çîrokek bi şewat û dilêşî a çûkê pepûkê tê gotin. Lê belê a balkêş ev e ku ev ne çîrok e, ev efsaneke mezin e; ev efsana xerîb û ecêb li ser xuh û birakî derbas dibe.

Weke ku tê zanîn bi piranî kereng li bakûrê Kurdîstanê gelekî çêdibin, kereng şênkahîyeke balkêş e, bi Latînê ji vê şênkahiyê re dibêjin; gundelîa toûrnefortî. Piştî berfa sere çîyaya dihile ev şênkahî derdikeve. Ji alîyê pîrekê kerengvanan tên danhev û piştî paqijkirinê bi xavî jî tê xwarin, wekî din xwarin jî jê çêdibe. A herî balkêş ji şîrika keranga benîşt(kaçik-qajik) jî çêdibe. Heger hûn wan dema li heremê bi ser rêkê de herin, hûn ê bibinin ku li alîyê rîya bi çewala kerengê ku tê firotin hene.

Qehremana vê çîrokê çûka pepûkê ya tirsonekî ye; eceb e, poşmantîyê nişan dide. Niha ev efsana ku mirov fêrî gelek tiştan dike, ez ê bi kurtayî bînim ziman.

Li gora hatiye gotin; li gundekî ku li serê çîyakî bû û derdora gund bi daristana hatibû xemilandin, malbatek bi keçek, kurek, dê û bav bihevre li vî gundî jiyana xwe dom dikirin. Gundîya hema zanîbû ku ev malbat dilxweş e, eşqa dê û bav ji alîyê herkesî ve xweş dihat dîtin. Lê çî bû, rojekê diya malê

ne xweş ket, bi temenekî ciwantî çû ser dilovanîya xwe. Çi fêde ew jiyana xweş û tişê hejêkirin û bi kêf li paş ma.

Ji bona xwarinek di mal de çêbibe, bavê zaroka ji neçarî zewicî. Lê ev jinbava nû hatî, tu car hez ji zarokan nekir û weke dujmina li zaroka dinerî. Dema firset diket destê wê, zulûm li wan dikir. Zaroka ji tirsê jinbava xwe nê zalim, nikarîbûn rewşa xwe ji bavê xwe re bejin. Lê her bav dema ji mal derdiket zulûm û hêsîrtî dest pê dikir. Rojekê dema bavê zaroka ne li mal bû jinbavê tûrikek û bivirek xistîye destê zaroka û şandîne çolê ku kerenga bidin hev û zirt li wan kirîye, gotîye; heger hûn bê kereng vegerin, hûn ê lêxistinê bixun.

Xuh û birê xwe çûne çolê û dest bi danheva kerenga kirine. Her keçik kerengan dide hev, ji bona têxe tûrkê xwe, wan dide birê xwe. Ber êvarkî keçik dinere ku di tûrik de tu kereng tunene. Keçik ji birê xwe gelekî qeherîye û gotîye; te ev kereng hemû xwarine. Lê birê keçikê sûnd xwarîye ku tiştik bi van kerenga nekirîye û nexwarîye. Keçikê gotîye êvarî wê rewşa me ne baş be, em ê lêxistinê bixun.

Birê wê gotîye; heger tu ji min bahwer nake, were nava min biqelêşe binere, tê bibîne ku di nava min de tu kereng tunene. Xuha wî gotîye; baş e. Rahîştîye kêra xwe û zikê birê xwe qelişandîye. Nerîye ku bi rastî di zikê birê wê de tu kereng tunene. Ê wî çaxî ev kereng çûne bi kû de. Di dawî de dibîne ku, ev jinbava zalim ji bona ku lêxistinê û tehn û niça bide zaroka qulek di binê tûrik de vekirîye, ji lewma her

kerengê diket tûrik di cî de diket xwarê û winda dibû. Ji bo wilo tûrik mabû vala.

Keçikê nerîye birê wê gelek xwînê winda dike, radibe dest bi dirûtina zikê birê xwe dike. Lê çi fêde, birê wê dimre! Keçikê laşê birê xwe li qiraxa çemekî binerd dike. Keçik bi kuştina birê xwe gelekî êşîyaye û eziyet kişandiye. Terhek ji dara gulekê jê kirîye û li ber serê birayê xwe çandîye.

Keçikê bi azabê êşa birayê xwe li ber Xwedê geryaye û gotiye; ya Rebî, min bike çûkekî pepûk ji bo ez li ser çîya û daristana hertim bifirim û ji xwe biqehirim ku ez bi gunehim û min birê xwe kuştîye.

Xwedê bergera keçikê pejrandiye û keçik kirîye çûkek pepûk. Ev çûkê pepûkê, çi roja heye li ser çîya û daristana firîyaye û bi şewatî xwendîye, hercar gotîye; min bire xwe kuşt, ez bûm sebebê mirina wî. Çîroka çûkê pepûkê ev e.

Dibêjin; her demsala çele diqede, di serê demsala biharê de dema kereng derdikevin, Xwedê giravî ev çûk dest bi xwendinê dike. Di nav xelkê de tê gotin ku, dema ev çûkê pepûkê dixwîne weke dibêje; kê kuşt, min kûşt, kê şûşt min şûşt, pepûk!. Bi vî awayê bi sedan salin ev çîrok wilo dom dike.

MINMINÎK (BAPERÎK)



Min şevê din di xewna xwe de dît ku demsala nû a biharê bû, rojê gelekî xweş, tava rokê bi çîrûskan tîrêjê xwe davêtin ser rûyê erdê. Wê rojê min di gwîzîkek ku bûye dualî de çavê xwe vekir ku ez bûme çêlîkek baperîkekê û min şewqa rojê a xweşik dît. Min çavê xwe grand, min dît ku ez weke ferîşteyekê di buhuştê de dijî, wilo sipî weke berfê û baskê min weke perdekî narîn û nazik ji firandinê re amade ne. Lê ji nişkê ve min xwe di nava bexçeyekî tije gulê renga reng de dît. Min baskê xwe nî biçûk vekirin û ev cara yekem e bi firandinê ez li dora bexçe geriyam û bi her alî de firîyam.

Ji bo ku cara yekem ez firîyabûm, ez pir betilîm. Ji bo ku ez bêhna xwe berdim, min xwest ku ez li ser guleke sor deynim. Piştî min li ser gulê danî, min baskê xwe bi carekê re danî ser hev. Dûra min li derdora xwe temaşe kir û min bi nerînek xweş li şînahîyê meyze kir. Min çavê xwe grand û bi seetan li derdorê temaşe kir. Pir bêhna min hatibû ber min, êdî ji niha û pêde dema gerê bû.

Ez bi xwe re diketim fikaran. Hewce bû jiyana min dom kiriba, di pêşerojê de rojin dirêj min li pêşîya xwe didîtin. Dûra ez firîyam ser dar û bera û li ser gulê rengareng. Bi wî awayî min xwe azad didît û ez pir bextîyar bûm. Çi kesê ku

ez didîtîm, ji xwe re digotîn ev baperîka xweşikî sipî, weke lepikî berfê, çikasî xweşik e. Bi vî awayî ez heya demê êvarî gerîyam.

Dema roj ber bi ava de çû, hisekî ne gelekî xweş hat û ser dilê min girt. Lê belê bi lêxistina zengilê derîyê me ve ez ji xew rabûm, min nerî ku min xewn dîtîye. Bi rastî ez pir xemgîn bûm, çimkî ez weke baperîkekê azad bûm, ew azad-bûna min piştî ez ji xew rabûm qedîyabû.

Min pir meraq kir û ji bo ez vê meraqa xwe ji nav bibim min li ser baperîka an minminîka lêkolin kir. Min nerî ku temenê minminîka bi tene rojek e. Heger ez bi zengilê derîyê me şiyar nebama, ez di xewa xwe de minminîkek bûm û temenê min jî bi tenê rojek bû û ew roj jî bi dawî hatibû. Careke din min ê li roja ber ava nerîba û ez ê têketima xeyalin dirêj û kûr û dibe ku ez qet careke din hew şiyar bibama.

ELÎKÊ SÊWÎ



Gundekî derdora wî bê dar û ber, bê av û şînkahî, qasî deh pazde malbata tevî zarok û jinan bi qasî 75 kesa têde dijîyan. Yek ji van malbatan, malbata Hesenê Kalo bû. Hesenê Kalo bi xwe, zilamekî nexweş bû, bi êşa zirav ketibû. Bi sala di karê zor de şixulbû. Jiyana wî ne baş derbas bibû, feqîrtî û xizanî wîna kiribû weke ta û derzîyê. Jina wî û lawekî wî hebû, navê layê wî Elî bû. Elî şeş salî bû. Hesenê Mala Kalo zilamekî gelekî bi derd û kul bû, tu xortanî ji xwe re nedîtibû. Em karin bêjin, tu carî jiyaneke wî ya weke mirovan çenebibû. Rojek berî rojekê dixwest bimre. Lê digot; ger ez bimrim wê Elî sêwî bimîne, wê herkes henekê xwe pê bike û jêre bêje Eliyê sêwî. Ji bo wilo gelekî xem dixwarin. Welhasil Hesenê Mala Kalo rojekê di nav cîhê xwe de bê his û deng çavê xwe girtin û çû ser dilovanîya xwe. Elî û dîya xwe man bê kes û kûs.

Her çiqasî Hesenê Mala Kalo nexweş ba jî, dema li mal û di nav cîhê xwe de ba jî, mirov digot zilamek di wê malê de heyê. Lê piştî rehmetî çû ser dilovanîya xwe, weke ku ew difikirî navê layê wî ma Elîkê sêwî. Di bin vê jiyana zor û bê merhamet de Elî û diya xwe bi zor û bela li ser nîga diman bi vî awayî.

Roj, meh, sal derbas dibin, Elî mezin dibe. Lê belê her Elî mezin dibe, dîya Elî pêre di nav salan de dire û pîr dibe.

Dîya Elî bi çî zorê û di rewşek ne baş de layê xwe gîhand heya 15 salî. Dîya Elî jî nema karîbû tu karî bike. Jixwe gundê wan bi tevahî feqîr û xizan bû. Elî tu karê ku kare bike jî li wî gundî tunebû.

Rojekê sere xwe danî ser kaboka dîya xwe û jê re got: “Yadê, va te ez mezin kirim. Ji roja îro û pêde divê ez li te binerim û te xwedî bikim. Va tu jî roj bi roj pîr dibe, taqeta te nema weke berê heye, tu nema kare karekî bike û ez li vê dera bê îş û bê şixul karim çî bikim. Divê ez herim ji xwe re karekî, qîsmetekî bibînim. Heya ez nerim dereke dûr, ez nikarim tu karî ji xwe re bibinim, divê ez herim bi ser oxura xwe de.”

Elî radibe kar û barê xwe dike, hinek xwarin û erzaq ji xwe re debar û amade dike. Kera xwe kurtan dike û sibehekê zû derdike, berê xwe dide welatê xerîb û xurbetê. Bi şev û roj dimeşe. Di derin ku hîn di jiyana xwe de ne dîtîye û ne bînayî re derbas dibe.

Rojekê ber êvarkî digihe ber zevîyekî ku darek li qiraxa zevî heye, sîya wê darê gelekî xweş û tarî ye. Kerê xwe bi qurmê darê ve girê dide, hinek xwarin dixwe, avê vedixwe lê hingî betilîye ji ber ku bi şev û roja meşîyaye, dikeve xewek şêrîn û xew lê giran dibe.

Sere sibehekê xwedîyê erda tê dinere ku vaye xortekî nuh gihayî li bin dara wî razaye. Çiqasî lê dinere, ev xort naşibe mirovê wî welatî. Xort ji xew radike, hinek xwarin û avê dide xort û pirs dike; tu kîye û tu ji ku tê, tê here bi ku de? Xort dibêje: “Ez li qîsmetê xwe digirim. Ez xortekî sêwî

me, bavê min tune, pîrek dîya min heye. Ew jî nexweş e li ber roja ye, ez dixwazim karekî, qismetekî ji xwe re bibinim û dûra herim bi diya xwe ve.”

Zilamê cotkar dibêje: “Xortê delal pir kêfa min ji te re hat. Were li ba min bimîne, ez û tu bihevre van zevîya bajon. Here dîya xwe jî werîne, jixwe keseke min jî tune, em ê bi hev bisitirin.” Xort dibêje; na, divê ez bi ser rîya xwe de herim heya ez qismetê xwe bibinim ka bê çi li pêşya min heye. Zilam dibêje: “Madem tu li ba min namîne, dema tu çû cihê ku te derdê xwe çareser kir, li halê min jî bipirs. Hersal ez di evqas zevîyan de genim diçînim, genim şîn tê lê dema çînîne tê û ez dikim ku herim biçînim, simbilê genim dişewite, reş dibe weke qîrê lê tê. Keda min î salekê dire bertelef.” Elikê sêwî dibêje; bela ez ê ji bo te jî bipirsim û dikeve ser rîya xwe û dimeşe.

Bê rawestandî bi şev dimeşe bi roj dimeşe, çend roja piştî derbasbûna li ser kaş û newalan, dinere derek şînkayî weke wahakê û di nava vê şînkahîyê de golek avê heye. Xwe bera qiraxa gola avê dide û dixwaze li wê derê raweste. Nanê xwe dixwe, ava xwe veduxe û hebekî kerê xwe diçêrîne, bi şînahîyê têr dike. Ew jî hebekî radizê bêhna xwe berdide.

Dibe sibeh, radibe ser xwe. Berî ku têkeve ser rîya xwe, dixwaze hinek av ji golê vexwe. Lê dinere ku masîkî xweşik tê qiraxa golê û jê re dibêje; tu kîye, tê here ku. Elî gelekî şaş dimîne, jê re dibêje; tu masî ye tu çawa wisa kare bi axive. Masî lê vedigerîne û dibêje: “Berî çend sala ez keça paşê vî welatî bûm. Min xweşikbûn ji tu kesî re nehiştibû. Lê hineka ji min re sihrek çekirîye, ez nizanim çîye.”

Piştî li masî guhdar dike, xort dibêje: “Divê ez herim bi rîya xwe de, bê ka bextê min çîye. Gelo ez ê bi ser bextê xwe vebim. Ez ê bipirsim bê ka ez ê çawa bijîm û pêşeroja min çîye.” Masî dibêje; ji min re soz bide ku te bextê xwe dît, ji bo min jî bipirse. Xort gotîye; ez soz didim ku ez ê ji bo te jî bipirsim. Û Elîkê sêwî dide ser rîya xwe û dimeşe.

Elî dîsa li kera xwe siwar dibe roj û şev derbas dibin. Rojekê dinere li pêşya wî bajarekî mezin heye. Xwe ber bi bajêr ve berdide û rast dire devê deriyê seraya mîrê wî welatî. Xulamê serayê wî dibin pêşberî mîr. Mîr dipirse; xortê delal tu kîye tu ji kû tê tê here kû.

Elî dibêje; ez li qismetê xwe digirim. Mîr dibêje: “Were li ba min bimîne û bi layê min re bibe heval. Layê mi hercar dire nêçîrê, ez dixwazim tu jêre bibe alîkar.” Elî dibêje; ez dixwazim herim bi rîya xwe de ku ez siûd û qismetê xwe bibînim. Elî çend roja li wî bajarî bêhna xwe berdide û dîsa dest bi rêwitîya xwe dike.

Elî piştî çend rojin dirêj, digihe gundeki û li qiraxa gund malek bi tena serê xwe heye. Elî rast dire deriyê wê malê û li derî dixîne. Derî vedibe dapîrek derdikeve û dibêje; te xêr e xortê delal. Xort dibêje: “Ez rêwî me bi rîya xwede dirim. Heger tu ji kerema xwe re hebek nan û avnê bide min ez ê gelekî, kêfxweş bibim.” Pîrê dibêje; tu li ser vî kevirê ber derî rûnê ez ê nan û xwarinê ji te re bînim.

Piştî çend demhûra pîrê xwarinê ji xortre tîne, Elî dest bi xwarina xwe dike. Pîrê pirs dike û dibêje; xortê delal tu ji kû

tê, tê here kû. Elî bersiv dide û dibêje: “Lê nepirse pîra delal. Ev demekî dirêj e ez ji mala xwe derketime û ez li siûda xwe digirim, ji bo ez zanibim bê ka çi li pêşîya min e.”

Pîrê dibêje; xortê delal a qenc tu vegere mala xwe. Destê xwe datîne ser anîya Elî û dibêje; herdu çavê xwe bigre. Elî herdû çavê xwe digre. Pîrê dibêje: “Lawo li vegerê sê qismet li pêşîya te hene. Tu kîjanî hilbijêre wê ji bo te qenc û baş be.”

Pir kêfa Elî ji va axavtinê pîrê re tê. Elî çend roja bêhna xwe berdide û karê vegerê dike. Gava dixwaze xatir ji pîrê bixwaze û destê pîrê maçî dike; mîrê bajêr, masî û cotkar tê bîra wî. Elî ji pîrê re dibêje: “Çend hêvîyê min ji te hene. Dema ez bi rê de hatim hal û mesela min ev e. Mîrê wela-tekî, masîkî di gola avê de û cotkarek ji min hêvî kirin ku ez li qismetê wan jî bipirsim. Heger tu karibe di derbarê wan de jî tiştêkî bêje baş e.”

Pîrê dibêje: “Lawekî mîr heye, lê ne kur e ew keç e. Ji fedîbûna re cilê xorta li keça xwe kirine, ji bo kesek nebêje mîr bê dûnde ye. Masî jî bi xwe keçmîrek e. Pîrek sêhirdar derzîkî xilqandî di nava pişta wê de çikandîye, bi rîya sêhrê bûye masî. Heger kesek wê derzîyê derxîne wê masî weke berê bibe keçmîrek pir xweşik. Di nav zevîyê cotkar de jî xezîneyek zêra heye, ku derxe wê pê gelekî dewlemend bibe.”

Piştî Elî van agahîya dibîhîze, carek din xatir dixwaze û dikeve ser rîya xwe. Piştî meşa bi roj û şeva digihe bajarê mîr. Dire mala mîr. Elî xweş pêşwazî dikin. Elî ji mîr re dibêje: “Mîrê min, ev kurê te bi xwe keç e ne law e. Ne hewce ye ku

tu fedî bike û cilê xorta li keça xwe bike. Tu mîr e tu zana ye, dibêjin şêr şêr e çi jin e çi mêr e. Keç weke lawa bi nirxin.”

Mîr dibêje; xortê delal mînaye tu xortekî jîr û biaqil e, ka were bi keça min re bi zewice û li ser textê min rûnê. Elî vê daxwazîya mîr qebûl nakê û dibêje; ezê herim mala xwe û li benda siûda xwe bim.

Carek din Elî li kera xwe swar dibe û dikeve ser rîya xwe. Dîsa tê ser gola avê rûdinê avê vedixwe û kera xwe diçêrîne, ji alîkî din ve çavê xwe li masî digêrîne. Piştî demekê masî serê xwe ji nav avê derdixe û ji Elî dipirse; ka te siûda xwe dît? Elî dibêje; na ez ê vegerim malê, ez ê li mal li bende siûd û bextê xwe bim. Masî carek din dipirse; ka te ji bo min tiştek dî, an te pirsî? Elî dibêje; tu keçmîrek xweşik e, pîrek sihirdar derzîk di pişta te de çikandîye, heger ez wê derzîyê derxim tê bibe weke berê keçmîrek xweşik.

Masî dibêje; were wê derzîyê derxîne û bi min re bi-zewice, li ser textê min rûnê û bibe mîrê welatê min. Elî vê daxwazê jî qebûl nake û dest bi meşa vegeza xwe dike. Lê berî ku bide rê derzîyê ji nav pişta masî derdixe, masî weke berê dibe keçmîrek pir xweşik.

Elî carek din dikeve ser rîyek dûdirêj. Ji tîna û nêza di-keve rewşek pir xirab. Elî dîsa li cotkar rast tê û li bin dara nav zevîyê cotkar rûdinê. Cotkar xwarin û avê dide Elî. Kera Elî jî hinek kayê dixwe. Elî jî cotkar re dibêje; xezîneyek di nav zewîyê te de veşartîye, ger tu erdê bikole wê xezîne derkeve û tê pê bibe maldarekî herî mezin ê vê derdorê.

Cotkar ji Elî re dibêje; were bi min re alîkarîyê bike em vê xezînê derxînin û bihev re em di xweşîyê de bijîn. Elî carek din vê teklîfê jî qebûl nake û dixwaze vegere mala xwe. Bi rê de kera Elî ji tîna dibehce. Elî dimîne peya, bê av û xwarin bi roja dimeşe.

Di dawî de bi rewşek nexweş vedigere mala xwe, dinere diya wî ketîyê halekî pir xirab. Ji qehra layê xwe re nîv korî bûye. Elî destê diya xwe maç dike û li ba diya xwe rûdinê. Roj meh derbas dibin, lê tu siûd bi dû Elî de nayin. Di vê navê re diya Elî ji feqîrtîyê dire ser dilovanîya xwe. Elî bi tevahî sêwî dimîne, bêkes û kûs.

Elî ji dapîra ku axivtinên xweş jêre gotibûn pir diqehere. Rojekê ji xwe re digot ka ew siûd li kû ma, ka çima nehat. Ji nişka ve dapîra ku lê rast hatibû li ber xanîyê Elîyê sêwî peyda bû. Elî rabû ser xwe çû destê pîrê maçî kir û got: “Pîrê ev çiqas roj û meh derbas bûn, lê tu siûd bext ji min re nehat. Çavê min qerimîn li ser van rîyan.” Pîrê got: “Xortê delal, min di serî de ji te re got, li vegeêrê sê şens wê ji te re derkevin tu kîjanê bipejirîne tu zane. Lê belê te li vegera xwe sê daxwazî red kirin.” Elî ket fikara, nerî ku çî şaşitî kirine. Heya li dor xwe zîvirê nerî ku pîrê ji zûve ji holê winda bûye.

LÎLA



Xortek ji gundekî hêla Omerya, bi malbata xwe re dema hîn zaro bû koçberî navçeya Nisêbînê dibin. Dema sal di navberê de derbas dibin, piştî dibistana seretayî û navend xwe di dibistana amadeyî de qeyd dike. Bi serkeftinek herî baş dibistana amadeyî li bajarê Mêrdîne diqedîne û ji bo zankoyê bixwîne dire Stenbolê.

Tê zanîn ku bajarê Stenbolê bajarê Tirkîyê yê herî mezin e û bajarekî gelekî qelabalix e. Xort biryar dide û piştî ezmûnek giran di Zanîngeha ÎTÛ de Beşa Endezyarîyê ya Makîna bi dest dixîne. Piştî zankoyê diqedîne vedigere welatê xwe û daxwaza wî nî a herî mezin ji welatê xwe re kar bike. Lê şert û şîrûtê wan dema tu derfetê nade ku karê xwe nî endezyarîyê bi cih bîne. Divîbû bi awayekî din karekî bike ku jiyana xwe û malbata xwe bidomîne. Lê dema mirov bide dû riya rast kare mirov xwar dire an bi xwarî derbas dibe. Ev tişteki hatîye ceribandin û bûye axaftinek bapîrê me.

Dema tu karê wî weke dixwest û bi xweşî neçû serî, xort derdikeve derî welat û li Dewleta Îngilîstanê bi cîh dibe. Roj derbas dibin, jiyana welatekî biyanî jî ne xweş e. Çir ku çand û hunera mirov ne weke hev e û jiyan bi zimanêke din ku ne weke zimanê dayîka mirov e, jiyana xerîbîy bi awayekî zor derbas dibe.

Li bajarê Londonê cîranekî vî xortê Omerî heye, ev cîran xwedî xwe û kûçikekî ye. Xwediyê kûçik gelekî hej

kûçikê xwe dîke. Her roj lê dibe xwedî û weke zarokekî lê dinere. Dema xortê Omerî û cîranê xwe bihev re dikevin têkilîye, xortê Omerî ji cîranê xwe re dibêje; bela kûçkê te bi aliyê min de neyê û qet nêzî min nebe, çimkî ez gelekî hej kûçka nakim. Cîran şaş dimîne û dibêje; cîran te xêr e, ev kûçik jî zindîkî weke mirova ye, çima tu hevqasî dûrî kûçik dire, ma kûçika çî ji te kirîye.

Xortê Omerî dinere ku divê bersivê bide û xwe bi-parêze, çimkî xort weke yekî dijî heywana an jî dijî zindîtiyê hate dîtin. Xortê Omerî dest bi axivtinê dike û dibêje; cîran ez bi xwe ne weke tu dibîne ku ez dijî zindîya me an kûçka, lê weke min got ez hej kûçika nakim. Xort axavtina xwe dom dike û dibêje “Dema ez zarok bûm dibe ku ez sê çar salî bûm, wa dema xalê min li Almaniya Rojava zanîngeh dixwend. Dema dihat welat, ji me re çikolata tanî lê çikolatê tanî hinêkî hindik û hebekî biçûk bûn. Ji ber ku ev çikolata ji bo zaroka bûn jê re digotin kinder schokolade, yani bi Îngilîzî jî dibêjin child chokolad. Ev têra me nedikir, çimkî em gelek zarok bûn. Weke xalê min digot, li Almaniya kûçik wî hebû. Yekî Îtalî ev kûçik dabû xalê min. Digot navê kûçik Lîla bû, Lîla şandibûn dibistanê şeş meha hemû tiştî fêr û hîn bibû. Heya bi nasnameya wî kûçikî hebû. Li gora xalê min digot, gelekî fahman bû yanê bi aqil bû. Lê dema xalê min digot, min Lîla bi schokoladê kîndera yanê çiqolatê zaroka xwedî dikir, ez pir aciz dibûm; ji ber ku di fîkara min de çiqolatê ku xalê min ji me re bi xwe re banya welat hemû Lîla xwaribû. Ji ber vê yekê ez tu carî hez ji kûçika nakim. Û kûçik li ber çavê min reş bûne. Cîran li min bibhure.

XATÊ Û BIRO



Berî bi gelek salan li welatekî gelekî dûr, li qiraxa çemekî gundek mezin û bi dar û bi ber û şînkaya wê xweşik hebû. Ew gund li alîyê din ê dinyayê bû, weke min gotibû gelekî dûr bû. Dema ku baran nedihat rok pir xweş û zelal bû, çaxa ku ewr tunebana ezman ji steyrika dihat dagirtin. Şînkaya wî gundî wek doşekê xûya dikir û te fedî dikir tu lê binere.

Gundî hemû bi cot û nêçîrê mijûl dibûn û jîyana wana wilo derbas dibû. Diçûn çola, heyvanê berrî digirtin. Û ava xwe ji çemê ku di nav gundê wan re derbas dibû tanîn. Xelkê wî gundî hema pir hej hevdû dikirin. Lê belê di nava yekî gundî de wîlo evîndarekî mezin hebû di ser evînîya heman re bû. Ev evînî, evînîya Xatê û Biro bû. Biro Xatê ji nêzîkayî ve nasnedikir. Evina wan ji durayî bû.

Rokê Biro hew debar kir û riyek dît çû ba Xatê, jê pirsî; tu kare bi min re bizewice? Xatê cevab da û got: “Erê, lê gelek şert û şîrûtê bavê min hene. Gelek xort hatin ez xwestim; bavê min ev şert û şîrûtê xwe dan ber wana, lê kesek ji van xorta ev şert û şîrût nanîn cih. Ji bo we yekê bavê min ez nedam wana. Heger tu wan şerta karibe bîne cih, kerem bik wer min bixwaz.” Biro got; bela bêj bê şertê te u bavê te çiye, ji bo evîna te ez karim çi şertê te yî heye qebûl bikim.

Xatê got: “şerte me ev e: Gulek heye pelê wê ji zêr û kulîlka wê ji yaqût û elmasa ye. Heger tu karibe here bîne, wê bavê min min bide te.”

Biro got; tu li bende min bisekine, ez ê herim bînim, lê ez nizanim ew gul li ku ye. Xatê rê peş Biro kir û got; ew gul li serê wî çemê ku di nav gundê me re derbas dibe. Xatê carek din got; lê divê tu qedarê çil rojî bimeşe.

Biro got; xem nake, ku ez nemrim ez ê zû bêm. Xatê got: “Biro riya te a xêrê be, here ji te re oxir be. Lê heya niha kes venegeriyaye; belkî wan dera ji vê derê hin xweştir e ji bo wilo kes venagere. Biro ji Xatê re got: “Ez baş dizanim ku kesik ji te xweşiktir tuneye li ser rûkê vê dinyayê. Netirse ez ê wê gulê ji te re binîm. Çima, hingî ku ez geleki ji te hez dikim. Bêyî te ev dinya lê nehêjaye.”

Biro derketiye ser rê, berê xwe daye jor û çem û çem çil rojî meşiyaye. Di van çil rojî de tevayî li ser Xatê fikirîye. Ji keynî Xatê, di hiş û sevdanê wî de tiştek tunebû. Armanca wî ew gula pelzêrîn bû.

Rojekê serê sibehê Biro rabûye, dev û rûyê xwe şûştiye û wilo li dor xwe neriye, fêm kiriye ku rêka wî hindik maye, ji ber ku îca av geleki cemidî bû. Lê Biro riya xwe devam kiriye.

Piştî wextekî hindik gihaye serê avê cihê ku av jê derdikeve. Biro çî binere go çiyî av ji ti der golek mezin û dora wê hemû gihayê şin e û bi dar û ber in. Lê di orta golê de cezirekî biçûk heye û ew gula ku pelê wê ji zêr di nivê wê

de ye. Fê m kir ku gula Xatê digot ev gul e. Çima! Ji ber ku ev gul gelekî xweşik bû, çavê mirov tê de venedibû. Biro cilê xwe danîn, ket golê û berê xwe da gulê. Piştî Biro giha nezîkî gulê, ji nişkê ve zilamekî xerîb derket pêşîya wî. Wi zilamî ji Biro re got: “Çi gula heye dirîkî wê heye ji bo ku wê gulê biparêze. Ez jî parêzerê vê gulê me û ez nahêlim ku tu vê gulê biçine û bibe ji xwe re.

Biro pir şaş maye û gotîye: “Ez Biro me, ez ji rîyek gelekî dûr hatime. Ez ê vê gulê bibim û ez ê bigihê m miradê xwe. Kesek nikare min ji biryara min ve gerîne.” Wî çaxî zilam jî gotîye: “Biner navê min jî Salût e û divê tu li min guhdar bike. Acep tu zane çima min ji te re got ku tu nikare vê gulê bibe. Ez ê ji te re bibejim. Heger wî çaxî te yeqîn nekir, dîsa rab û gulê ji xwe re bibe.”

Biro bi guhekî vekirî li Salût hishisîye. Salût gotîye: “Tişte kî ku mirov ji xwe re gelekî bixwaze û li pêşîya wî tiştî tu pirs girêk tunebe, mirov dikare ji xwe re bibe. Jiyan jî wilo ye. Heger li pêşîya mirov pirs girêk tunebin, mirov kare jiyana xwe pir xweşik bidomîne. Ey birayê Biro her tişte kî taybetmendîyek xwe heye, ev gul ji taybetmendîya wê ev e: Di bîst û heşt şevan de vedibe û pelê xwe diweşîne nav çem. Bi xêra wan pela ava çem pir bilind dibe û diherike nav newala û evqas dar û ber û gul û çîmen pê şîn tîn.”

Biro serê xwe xist ber xwe û dest pê kir kûr kûr di xwe de fikirî. Dawî got “Heger ez wê gulê bibim ezê bigihim meqsed û miradê xwe, lê evqas dar û ber wê dîsa biqelin.

Heger ez nebim wê evqas dar û ber hemû weke berê şîn bimînin.” Bi roja dimîne sekinê û di xwe de difikire, nema zane bê wê çawa bike. Ji alîkî ve evîna wî û ji aliyê din ve av û şînahî.

Piştî gellek rojan Biro nema ji jiyana xwe jî tehm distend. Mabû weke şaşa. Erê tiştê Xatê dixwest ev gula zêrînî bû. Piştî bîst û heyşt roja gul vedibe û bizrê xwe bera ser gola avê dide, lê yek lib bizir dikeve ser dilê Biro. Ji nivşkê ve Biro dibe tehtek bi qasî evîna xwe yî mezin. Teht wilo mezin dibe û wilo mezin dibe û bilind dibe, dibe wek dinyakê û bi dinyayê re dest bi gerê dike. Biro dibe heyv, piştî wîqasî hemû tiştê Xatê dibe heyv ji dilê Biro re. Ji loma Biro di her 28 şevan de dilê xwe ji tiştin din re vedike û şewqa xwe dide dora xwe wek wê gulê.

BARKÊŞ



Zilamekî ku her roj ji sibehê heya êvarê barkêşî dikir û debara mala xwe bi vî rengî dom dikir; rojekê karê xwe nî wê rojê heya êvarê xelas kiribû û bi wê betilandinê diçû mala xwe. Bi rastî wê rojê gelekî westiyayî bû. Heman demê, mirovekî dewlemend ê ku li ser rê lê rast hat bi cil û bergên xwe yê dewlemendiya wî dida der û destê wî tijî pakêt û di rewşek nexweş de bû; ji ê barkêş re got, were alikariya min bike ez ê sê şîretên girîng li te bikim. Ê hemal ji xwe re got: “Îro min çiqas pere qezenc kiribe besî min e. Her hal mala vî kesî li ser rîya min e. Ev sê şîretê ku li min bên kirin dibe ku di pêşerojê de bi kêrî min bên.” Hemal razî bû ku barê merivê dewlemend hilgire û jê xwest ku şîretan li wî bike.

Hemal radihêje firax û pakêtan ji dest mirovê dewlemend û ber bi mala wî ve dimeşin. Mirovê dewlemend ji dest bi şîretkirinê xwe dike û dibêje; binêre axayê barkêş ê delal, tu tucarî bawer neke heger kesek ji te re bibêje peyabûn çêtire ji swarbûnê. E hemal di dilê xwe de got, her kes vena zane. Lê bi sebir ma li bende şîretê din.

Piştî çend gavan ê hemal bi baldarî li bende şîreta duyemîn bû, hêvî dikir ku vê carê mirovê dewlemend şîreteke bedew lê bike da ku sûtê jê werbigire. Mirovê dewlemend şîreta duyemîn dibêje; heger kesekî got sekinandina li ber

tavê çêtire ji ber siyê, carek din tu qet bawer neke. Hemal her bi her hêrs dibû, lê dîsa tiştek li xwe çênedikir, di dilê xwe de digot; ka bisekine, dibe ku şîreta sisêyan pir hêja be û gelekî bi kêrî te bê. Dora şîreta sêyemîn e; heger kesekî ji te re got, nane tisî û hişk xweştirê ji xwarinê, dîsa tu bawer neke. Hemal dest bi kufte kufte kiribû...

Zilamê dewlemend carek din dubare kir û got; ezbenî, ev sê şîretê gelekî girîng in, gerek tu xweş zanibe û ji bîr neke. Mêrikê barkêş got; gelekî baş e pir spas, ev şîretê wisa girîng û bi nirx tu carî nayê jibîrkin! Di vê navberê de, herdu hatine ber deriyê xaniyê qata sêyemîn ê ku mêrkê dewlemend lê bicîh dibe. Barkêş firax û pakêtên ku di destê wî de ber bi derenceyan ve berdide bi jêr de. Paket û firax hemû yek bi yek gindirîne heya ku li derenca jêrî sekinîne. Barkêş bi dengê nerm gazî zilamê dewlemend kirîye û gotîye: “Binere ezbenî! Heger kesekî ji te re bibêje ku di pakêtên te de tiştekî saxlem wê mabin, tu jî qet bawer neke.”

BEHLÛL-Î ZANA



Tê zanîn ku Harûn Reşîd di demê xwe de xelîfeyê Dewleta Abasîyan bû. Û bîrayê Behlûlî Zana bû. Behlûl gelekî jîr bû û ji ber ku ji malbatek naskirî û bi kok dihat, bi mejî jî di asteke bilind de bû. Lê herkes difikirî ku Behlûl dîn e. Ya rastî wî şîret li her kesî dikirin. Bi saya şîretê ku wî li xelkê dikir, gelek kar û xebat rast dimeşîya.

Di rojek xweş de, Harûn û birayê wî Behlûl yê zana bihev, li nav baxçeyê qesra Abasiya ya li Bexdayê digeriyân. Harûn dixwest ku Behlûlê zana û jîrek hinekî derewîn derxîne. Harûn Reşîd bi xwe neteweperestekî Ereban bû. Ev fikir ji ku derê hat bîra wî mirov nizane; pirsekê ji birayê xwe dike, dibêje; Behlûlê delal, ka bêje bê Ereban an Kurd kî ji wan jêhatîtir e. Behlûl dibêje; nîqaşek weha hebe jî bi rastî gelekî balkêş e. Harûn Reşîd weke zarokêkî, ji nişka ve hêrs dibe û dibêje; ku pirsek wusa hebe jî, bêguman Ereban zanatir û hîn bêhtir zîrek in. Behlûl berevajî wê dibêje: “Kurd ji me Ereban hîn bêhtir zîrek in. Heke hûn bixwazin, ka em bangî Ereban û Kurdekî bikin, em pîrsa ji wan herdukan bikin, bê kî jîr e wê yekser xuya bibe.” Birayê wî Harûn Reşîd dibêje; baş e.

Ji nav kesên ku di wir re derbas dibûn, ewilî bang yekî bi cil û bergê Kurdî dikin û tînin nav bexçê serayê. Behlûl ji

darê libek incas jêdike û dide destê ê Kurd û jê dipirse; ev çi ye? Ê Kurd incasê di dest xwe de dizîvirîne û dizîvirîne, çep û rast dinêre; lê nikare biryarekê rast bide. Di dawiyê de jî dibêje; ez nizanim bê ev çiyê. Harûn berê xwe dide Behlûl û dibêje, we dît, evna asta zanîna namzetê we ye, hûn qala çi dikin?

Behlûl ji birayê xwe re dibêje; bisekine, lezê neke, ka em gazî yekî Erebi jî bikin û bibînin bê ka ew çi dibêje. Dirin kesek Erebi ji rê vedigerînin û heman pirsê jê dikin. Ê Erebi nuh radihêje incasê û lê dinere, bê dudilî bersivê dide û dibêje; ev petêx e. Behlûl pir dikene û berê xwe dide birayê xwe, dibêje: “Namzetê min qe nebe nizanibû incas çiyê. Li aliyê din, Erebi te nizane incas çiyê û derdikeve holê ku ew nizane bê petêx jî çiyê. Birayê min î mezin, navdar û pir hêja, ka bêje bê Kurd an Erebi jîrin an kîjan ji wan keregêj in?”

CENGA MIŞK Û PISÎKAN



Malbateke pir maldar ku xwedî û xwe û hertiştî bû, jin û mêt bi tena serê xwe bê zarok, di qesrik sê qat de jiyana xwe dom dikirin. Her sibeh bihev re diçûn ser karê xwe. Dema ku ji mal derdiketin, ji pisîka xwe re digotin; “Em dirin, çavê te li mal be, em vê qesrê dispêrin te. Divê tu bala xwe bide derdora xwe.” Piştî jin û mêt ji mal derdikevin pisîk nane xwe dixwe, şîrê xwe vedixwe û dikeve xewa şêrîn.

Çend roja bi vî awayî dom dike, pisîk pir qelew dibe û tê rewşeke wilo ku nema karibe ji cîhê xwe rabe. Ev dîmen bala mişkekî dikşîne. Rojekê mişk û bi çend çêlikê xwe ve têt hundur, xwe ber bi çavê pisîkê dixînin, dinerin ku pisîk deng nake. Dûra ev mişk û çêlikê xwe, her roj dikevin aşxana qesrê û ji xwe re tede diçêrin. Rojekê bala jinka xwedîyê qesrê dikşîne, çimkî di aşxanê de li gûyê mişka rast têt.

A dinî roje pîrek bi ser pisîkê hildibe û dibêje: “Ma tu korî, ma tu nabînî! Her roj tu li mal radizê û mişk jî dikevin qesrê hemû derî dikin gemar. Em nema te dixwazin here derî din ji xwe re.” û pisîkê diqewirînin. Pisîk derdikeve derî malê û dire li kuç û kolana dimîne, bêxwedî.

Malbata maldar dirin pisîkekî nêr ji xwe re dikirin û tînin malê. Pisîk hivqasî girs e û çend mûyê dirêj di ber bêvla

wî de ne, bûye simbêlboq. Dema hinek pisîkê dibînin tirs û xof dikeve dile wan; rojek wilo hatiye ku mişk û zarokê xwe nema karibin serê xwe ji qula xwe derxînin. Bi roja mişk û zarokê xwe bê xwarin dimînin.

Mişk bazdaye çûye li kolana li pisîka kevn gerîyaye û derdê xwe jêre gotîye û dubare kirîye ku pisîk dîsa vegere mal. Mişk ji pisîkê re gotîye; ger tu venegere qesrê, dibe ku ez û çêlikê xwe hemû bihev re ji birçîbûna bimrin. Lê pisîka kevn ketiye rikê û gotîye: “Ez qet nema vedigerim. Xwedîyê min î kevn gelekî axavtinên pir ne baş û ne maqûl di derbarê min de kirine, tu rûyê min tune ku ez carek din bêm ber çavê wan.” Mişka dîya pênc çêlika, bi dilekî şikestî ve gerîyaye qonaxa mezin.

Roj derbas dibin, birçîbûnê li serê dîya çêlika xistîye. Mişka dilşewitî ji neçarî ji qula xwe derketîye û çend çêlikê wê jî pêre, berê xwe dane aşxanê û meşîyane. Dema gava xwe nî yekem avêtine aşxanê, pisîka bê îman xwe avêtîye ser mişk û çêlika. Pisîkê cengawer mişk û sê çêlik bihev re kuştine. Û du çêlikê din bazdane xwe ji mirinê xelas kirine.

Herdu çêlika bi lez xwe avêtine lexemeke gelekî kûr ku ava hemû karêzê lê hatîye rastkirin. Herdu çêlik birçî, bê dê û bê bav mane li rastê, kesekî ku alîkarîkê bike ji wan re tune. Çend roja bi vî awayî mane ji hev re gotine; divê berî ku em bimrin em heyfa diya xwe hilînin, wilo çênabe divê em ji xwe re çareserîyekê bibînin, yan em ê herdûk jî bimrin.”

Nerîne mişkekî nêr ku pirça wî nêvî weşîyaye, çavek ji ê wî kor e û li ser kevirêkî rûniştîye. Çêlika silav lê kirine û

alîkarî jê xwestîne. Mişkê kal gotîye; tu alîkarî ji min naye, lê çend heval hene di lexema pêş de, herin ji wan re rewşa xwe bêjin û qala min bikin, wê alîkarîyekê mezin bidin we.

Herdu çêlîka berê xwe dane lexema pêş de, nerîne ku lexemek hişk û ziwa ye; lê çi binerin! Gelek malbatên mişka bi tevayî, tev zarok, mezin, kal û pîra bihevre di wê lexemê de dijîn. Çimkî ew lexem berî çend sala nema bi kar tînin, vala ye. Mişkê cuda cuda weke cerdona, mişkê biçûk, ên mezin hemû bihevre ne. Herdu çêlîk pir kêfxweş bûne.

Wê rojê van mişka şahîyek li dar xistine nayê gotin; ji xwarinê, ji penêr û nan, vexwarin, tu çi bixwaze amade ye. Kêfa wan li cî ye, ê ku di lîstikê de ne, ê ku serê xwe dîtine, dengê mûsîka wan jî pir bilind e. Di vê rewşê de herdu çêlîka têr xwarinê, birçîbûna wan derbas bûye. Lê di nav wan mişkan de mişkekî xort heye; pir xortekî çeleng e, terî dirêj, simbêl boqî. Dema pozê xwe ber bi jor de bilind dike, diranê wî weke birrekê xuya dike. Herdu çêlîk ketine bin bandorekê mezin û xwestine bi vî xortî re xwe bidin naskirin ku alîkarîyekê jê bixwazin.

Herdu çêlîk bitirs û xof bi alî mişkê xort ve çûne, ev xof û tirs bala mişkê xort kişandîye, xort gotîye; çi derdê we heye, çima hûn bi tirs in. Çêlîka derdê xwe, bê çawa pisîka di qesra sê qat de dîya wan û xuh û birayê wan kuştîye, yek bi yek ji mişkê xort re gotine û bi mebesta heyfa xwe hilînin alîkarî jê xwestine. Xortê qelender dest daye û gotiye; bi soz û peyman wê heyfa we bê hilanîn, ev ji pisîka qesrê re

namîne. Pir kêfa mişqçêlikan hatîye. Mişkê xort ji çêlikan re gotîye; ji îro û pêde ev bûyer wê bibe erk û vatinîye me.

Mişkê xort çend mişkên qelender yê weke xwe û çend cerdonê weke gamêşa dane hev, çend lexem derbas kirine û ketine qesra ku pisîka kujer û mişkkuj têde. Mişka berê xwe daye aşxanê ku binerin bê ka pisîk li wir e an na.

Pisîkê pêjna mişka kirîye û berê xwe daye aşxanê. Piştî çend demhûra çavê pisîkê li mişkekî ketîye, ji nişkê ve xwe bilind kirîye û xwe avêtîye ser mişk. Çîzîni bi mişk ketîye û bazdaye, pisîkê jî daye dû. Di vê navê re pisîk li cerdonekî rast hatîye, nerîye ku cerdon pir mezin e xwe ji ser cerdon daye alîkî. Lê cerdon bi guhê pisîkê girtîye û perçek jê qut kirîye. Ji êşan re pisîk bazdaye û derketîye derve, kirîye hewar li pisîka; werin mişka êrîş anîye ser warê me!

Qasî deh pisîka xwe dane hev û hatine bi hewara hevalê xwe de, mişka jî ê ku hatibûn qesrê xwe kirine rêz û li dijî pisîka sekinîne. Mişkê xort li pisîka deng kirîye û gotîye; em ne hatine ku şer bikin, em dixwazin hûn pisîka di qesrê de bidin me, çimkî hevalek me û sê zarok bihevre kuştine. Pisîka bersiv dane û gotine; em tucarî hevalê xwe nadin ku hûn serê me jî jê bikin. Mişka gotîye: “Madem hûn hevalê xwe nadin em ê bi zorê ji we bistînin. Em ê dûra wî mehke-me bikin; heger gunehê wî tunebe em ê azad bikin, heger bi guneh be em ê wî bi dar vekin.” Di encamê de herdu alî di tu mijaran de li hev nekirine û biryara cengekî mezin dane.

Pisîk û mişka xwe dane hev, her alîkî ji xwe re arteşek li dar xistine. Her arteşek ji çend hezara hatîye holê. Ew mişkê

xort î çelenk bûye serbazê artêşa mişka. Pisîkê mişkkuj jî bûye serbazê artêşa pisîka.

Herdu artêş di meydana fireh de hatine pêşberî hev. Cara dawî qasid ji hev re şandine ku bêyî şer vê mijarê çareser bikin, lê pisîka nexwestine. Di dawî de şer dest pê kirîye. Mişkê nav mala bi hezaran ketine rêza pêş, cerdonê mezin ketine rêza duyem, mişkê biçûk jî li ser cerdona siwar bûne û bi vî awayî dest bi êrîşê kirine.

Pisîka jî xwe girêdane, li bende destûra ji serbaz bê ku têkevin nava şer. Mişkê çelenk nav di xwe de daye û gotîye: “Ez mişkê terî dirêj û simbêl boq im. Li meydanê weke deq im xwe bidin alî ez ê bi we de biteqim.”

Serbazê pisîka jî gotîye: “Ne hewceyî galgala û navdixwedanê ye, ezim pisîkê reşim li meydanê weke pilinga dimeşim, ji min bitirsin ez ê we hemûçkan bikujim.”

Wel hasil şer destpê kirîye, çozî çîzek ketîye meydana, dengê pisîk û mişka wilo tevhev bûye weke dengvedana tavê meha adar û sibatê. Mişkê biçûk ê li cerdona siwar bibûn dirin ser terîya cerdona, cerdon terîyê xwe bilind dikin û davêjin pisîka; mişkê biçûk li ser û guhê pisîka dikevin, diranê xwe dixin çavê pisîka wan kor dikin! Pisîk weke pêhlîwana xwe davêjin mişka, li hewa xwe qulopazî dikin û mişka dixeniqînin! Meydan ji xwînê sor bûye. Bi hezara hatine kuştin, ji laşê pisîk û mişka girik çêbûne.

Ev şer sê roj û sê şeva dom kirîye, lê tu alî zora aliyê din nebiriye. Lê belê bi hezara laş li meydanê mane. Herdu alî-

yan alê sipî hildane û xwestine cara dawî bihevre biaxivin. Serekê artêşa li hev rûniştine û gotine: “Ev şer wilo dom bike em ê mişk û pisîk hemû biqelin, wê nijadê me ji dinyê hilê. Divê em di navbera xwe de darê aşitîyê deynin.” Pisîka gotîye; pisîkê ku mişk kuşt hatîye kuştin, zarokê mişkê sêwî jî mirine, domkirina vî şerî bê fêde ye. Herdu alîyan xwe ji meydana şer vekişandine û di navbera wan de aşitî çêbûye. Roja îro mişk û pisîk di nav malan de bihevre weke xuh û bira dijîn.

Ê KU BI SIÛDA XWE RE DIAXIFE



Li gora ku hatiyê gotin, yekî êzingvan bi salan di nav daristanan de êzing birînê û ew êzing li nav bajaran firotine. Hatina perê wî qet têra wî û malbata wî nedikir, her roj zikêkî têr û yekî birçî. Zarokê wî stûxwar û bi awayekî belanzî di nav xelkê de jiyana xwe didomandin.

Rojekê li daristanê di dema birîna êzingan de dengik ji xafil û winda de tê guhê karker. Xof bi karker re çêdibe û ditirse. Ji xwe re dibêje; gelo ev dengê ku hat guhê min rast bû. Dûra ji xwe re nake tiştek û dest bi birîna darê xwe dike. Piştî çend hûrdemin din dîsa ew deng tê guhê wî. Ji xwe re dibêje; wile ev deng dengêkî rast e, divê ez binerim bê ev deng dengê çiyê an denge kêye.

Xwe hebekî bi nav daristanê de berdide, dinere ku qîzek gelek xweşik û pir delal di nav darek bi dirî de aliqîye û nema kare xwe xêlas bike. Ê karker ji wê keçika xweşik û delal dipirse û dibêje; tu kîye, tu bi serê xwe tenê li vê daristanê çî dike û çî digere. Keçik bersivê dide û dibêje; ez siûda te me, were min ji nav van dara xelas bike ez ê gencînekê pêş te bikim.

Karker ew keçika xweşik û delal ji nav dara bi dirî xelas dike û ji keçikê re dibêje; her mala xwe, tu karê te li nav daristana qet tune. Keçik dibêje: “Tu kare ji min xweş bahwer bike ku ez siûda te me. Li vê texma han gencînek heye derxîn û bibe ji xwe re.” Û ji xafil de ji holê winda dibe.

Karker wê gencînê derdixe, dinere ku kîsekî mezin tije zêr û xişir e. Bê deng û bê his wî kîsî dibe û zêran ji xwe re difiroşe. Roj bi roj hal û wextê karker xweş dibe. Karker ji tunebûn dibe maldarekî gelekî mezin. Xelk û derdora wî jêre dibêjin; evqas mal û milk tucarî bi firotina êzinga nayê holê, ka bêje ev çi mesele ye.

Karker nerî ku qet nema kare xwe biparêze. Ê karker neçar dimîne her tiştî bi rastî bibêje. Karker rojekê li nav civakê dibêje; ez li daristanê bûm min dar qût dikirin, siûda min hat bi min re axivî û evqas mal û milk siûda min pêş min kir. Mirov hemû qet bahwer nakin, dibêjin; evaya ne rast e, çilo mîrovek karibe bi siûda xwe re biaxive. Karker dibêje; evaya rast e, hûn zanin we divê bahwer bikin an na, ew di destê we de ye.

Yekî ji gundê êzingvan feqîr û tirale, ne şixûlker û zexel ji xwe re dibêje; ez ê jî herim daristanê û ez ê jî bi siûda xwe re biaxivim û ez ê jî bibim maldarekî mezin. Dide ser rê, berê xwe dide daristanê û diçe. Piştî çend demjimêran digihê daristanê, qederekî disekine û dimîne li bende ku dengêk bê gûhê wî. Ji xafil de dengêk tê guhê wî û dibêje; ez siûda te me! Ê gundî li paş xwe dinere ku waye pîrekik pir nexweşik û pîr û qermiçî. Ê gundî dimîne behetî û dibêje; evaya ne mumkun e, tu ne siûda min e, çima tu jî weke siûda xelkê ne xweşik e. Pîreka qermiçî dibêje: Tu jî ne şixûlker e û tu jî gelekî zexel û tirale ye. Li wê gorê siûda te ev e. Ez nikarim tu gencîna pêşwazî te bikim, tu li halê min dinerî.”
Û ji xafil de ji holê winda bû.

GERMAHÎYA ŞEWQÊ



Ber êvarkî axê eşîrekê di bexçê qesra xwe de digeriya. Çemê Xabûr jî di nêzîkî bexçê qesrê de derbas dibû û ji bexçê qesrê ve Çemê Xabûr dihat xuyakirin. Lê dem ber bi demsala çele de diçû û dinya sar dibû. Di wê demhûrê de tiştek tê aqîlê axê û ji xwe re dibêje; gelo kesek heye ku ji êvarê heya sibehê karibe di nav vî Çemê Xabûr î sar de niv tazî bimîne.

Axe a din î rojê ji bo civateke tevayî bang li xulamê qesra xwe dike. Dema li hev kom dibin, dide xuyakirin ku kî karibe ji êvarê heya sibehê di nav Çemê Xabûr de bimîne, wê qîza xwe ya bi tenê jê re bike xelat. Di nav civata qesrê de ji bo wî mercî kesekî wêrek dernakeve. Çimkî zanîbûn ku ji êvarî heya sibehê nikarin di nav ava sar de zindî bimînin.

Lê belê piştî ev biryar di nav civakê de hat bihîstin yekî xort, çeleng û hejar tê ba axê û jê re dibêje; ez ê karibim heya sibehê di nav çemê sar de bimînim. Çimkî hewcebûna wî xortê hejar bi qîza axê ya xweşik hebû, ji ber ku wê jiyanê wî xortî bi xêra wê qîzîkê bihata guhertin.

Ew şeva ku dixwestin hat û di bin çavdêriya du xulamê qesrê de xortê hejar dibin ber qiraxa Çemê Xabûr, xort dixin nav avê heya kabokê û wilo dihêlin di nav wê ava sar de.

Piştî demeke kin xortê hejar dest bi ricfê dike, çimkî ew dem dema êvarê ye û gelek demekî sar e. Ji alîkî din ve şewqê çirê qesrê jî, ji aliyê Çemê Xabûr ve xweş tên xuyakirin. Xortê hejar çav wan şewqê lembê qesrê dikeve û têhna germahîya wana tîne xeyalê xwe û bi wî hawayî heya demê sibehê di nav wê ava sar de zindî dimîne.

Dema dibe sibeh axe û xulamê xwe tên dinerin ku xortê hejar sax e û hîn nemirîye. Axe dibêje: “Te ev xelat qezenc kirîye, evaya mafê te ye ez ê qîza xwe bidim te. Lê belê divê tu ji me re bêje bê tu çawa di nav ava sar de wilo sax maye.” Xortê hêjar dibêje: “Şewqa lempê qesra te ji vir xuya dikir. Germahîya wa şevqa kete dilê min û min xwe germ hîs dikir, ji lewma ez mame sax.”

Piştî axe vê axaftinê dibihîze, dîn dibe û dibêje; te ez xapandime, ez qîza xwe bi vî awayî nema didim te û axe vedigere qesra xwe. Xortê hejar ji tirsra re tiştêkî ji axê re nabije, lê piştî çend meha dire ba serekê xulama û jêre derdê xwe dibêje. Serekê xulama dibêje; tu mafdar e neheqî li te bûye, ez ê alîkarîyê bi te re bikim.

Serekê xulama dire ba axê xwe û jêre dibêje: “Axê min ev çend salin ku ez xulamê te me, gelek qencî û alîkariya te gihaye min û malbata min. Ji bo vê yekê ez dixwazim rojekê te li mala xwe bikim mêvan.” Axe jî xulamê xwe naşkîne û banga wî qebûl dike.

Axe û bi çend zilamê xwe ve, tevde dirin mala serxulamê xwe. Li menzelekî mezin rûdinên, şevbuhêrka xwe

dikin û ji aliyê din ve li benda şîva êvarê ne; lê belê çend demjimêr derbas dibin û şîva wan nayê. Axe pir aciz dibe, derdikeve dire aşxana serxulam. Dinere ku beroşa xwarinê bi bin zikê xanî ve daliqandîye û li jêr agir dadaye. Axe dike gazî û dipirse; ma wê çilo ev xwarin çêbibe! Xulam bersiv dide; wê çêbibe. Axe pir hêrs dibe û derdikeve. Xulam jî bi dû wî de dire û ji axê xwe re dibêje: “Heger ev xwarin qet bi vî awayî çênebe, ew xortê hejar jî ji dûr ve qet germahîya şewqa qesra te nesitandîye. Lê te neheqî lê kir û te soza xwe neanî cih.” Axe difikire û dibêje; tu rast dibêje min pir neheqî li wî xortê hejar kirîye, bang lê bikin bela bê ez ê xelata wî qîza xwe bidêmê.

Xortê hejar bi qîza axê re dizewice, gelekî spasî xulamê axê dike û tev jina xwe dire mala xwe. Piştî bû zavê axê, halê xort xweş dibe û jiyanek bextewar derbas dike.

GUR Û ROVÎ



Zilamekî cotkar li gundê xwe diçû ku cotê xwe bike, di demê meşê de ji xafil de dinere ku gurekî bejayî pêrgî wî bû. Gur xwe ber bi cotkar ve dibe û li ber digere, dibêje: “Ji bo Xwedê min veşêre! Kervanekî nêçîrvana bi komek kûçîkê xwe ve bi lez bi dû min de ne, ez xweş dizanim ku wê min pare pare bikin.” Cotkar gur dixwe çewalekî merşînî, tavêje ser pişta xwe û meşa xwe dom dike.

Piştî çend demhûra nêçîrvan tên û pirs dikin; em bi dû gurekî de ne, gelo te dîtîye? Cotkar bersivê dide, dibêje; vê navroja han karê gura li ser vê rîya rast çiyê. Piştî bersiva cotkar nêçîrvan bi rîya xwe de diçin. Bi çûna nêçîrvanan re cotkar gur ji çewal derdixe û bihevre dimeşin.

Hîn çend gav neavêtine, gur ji cotkar re dibêje; ji bo alîkarîya te pir spas dikim, lê belê ez pir birçî bûme divê ez te niha bixwim. Cotkar dibêje; min jiyana te xelas kir, çilo dibe tu min bixwe. Gur pir bi biryar axavtina xwe dom dike û ji xafil de xwe çem dike cotkar dixwaze wî pare pare bike. Cotkar ji gur axaftineke dawî dixwaze, dibêje; ez dixwazim ku em ji sê ajala pirs bikin, ger maf dan te tu kare min bi serbestî bixwe. Gur gotîye bela û dest bi meşa xwe kirine.

Cara yekem pêrgî hespekê bûne, rewşa xwe ji hespê re gotine. Hesp jî bêfîkar biryara xwe daye û ji gur re gotîye; tu

kare vî cotkarî bixwe. Cotkar carek din pirs kirîye û gotîye; bê nîrxandin tu çawa biryar dide. Hesp bi dilekî axîn kişandin û bi keserekî dirêj carek din bersiv daye û gotiye: “25 salan min ji xwedîyê xwe re kar kir, lê piştî ez kal û pîr bûm ez avêtim ser kolana. Ji ber wilo ve maf heye ku gur û ajalê ku xwe bi goşt xwedî dikin mîrova bixwin.”

Piştî çend demhûrê din pêrgî kûçêkekî bûne, rewşa xwe ji kûçik re jî gotine. Kûçik jî weke hespê bi yek carê re gotîye; gur, vî zilamî bixwe. Gur şaş maye û pirsîye; çima? Kûçik gotiye: “Xwedîyê min jî yekî weke vî zilamî bû. Min temenê xwe li devê derîyê wîna derbas kir. Min bi canê xwe mala wî parast, lê piştî ku ez kal bûm hûn dibînin ez li parîkî nan digirim.”

Hemûkan bihev re meşa xwe dom kirine. Maye ajalekî dawî ku bibînin û pîrsa dawî bikin ji bo ku gur cotkar bixwe an na. Piştî nîrxandin û bi dozekî bilind rexnekirinê, pêrgî rovîkî hatine. Cotkar ji serî heya binî çîroka xwe ji rovî re gotîye. Rovî serî li xwe giran kirîye û gelekî ponijîye û di xwe de fikirîye. Hemû ajalan pirs kirîye; ka tu çi dibêje di vê derbarê de. Di dawî de rovî biryara xwe daye û bi zimanekî zanyarî bersiv daye û gotiye; ez ne bahwerim ku gur ketibe vî çewalî, heya ez bi çavê xwe nebînim ez nikarim tu gunehî têxim stûyê xwe.

Gur gotîye; pir rehet e û di cih de gur ketîye hundurê çewal. Rovî çavî nêçîrvan kirîye ji bo devê çewal bigre. Nêçîrvan devê çewal girtîye û bi dara bi gur ketine nihhawî

kirine. Nêçîrvan pir sipasî rovî kiriye. Îca herkes xwestiye dest bi meşa xwe bikin û herin bi rîya xwe de. Lê ji nişkê ve çavê nêçîrvan ketîye postê rovî û ji xwe re gotîye ku, ez vî postî li bajêr bifroşim dibe ku gelek pere bigre.

Nêçîrvan ji rovî re gotiye, ez tucar alîkarîya te ji bîr nakim. Lê weke gur gotibû peyvek bapîra heye, tiştê weke qencîyê ku zû tê jibîrkin tuneye. Rovî gotîye; bi rastî min tu tişt fêhm nekir ev peyv tê çî manê. Nêçîrvan gotîye; niha te qencî bi min kir ne wisa. Rovî gotîye; belê. Nêçîrvan gotîye: “Niha ez vê qencî û alîkarîya te ji bîr bikim û te bikujim û postê te herim bajêr bifroşim. Tê vê manê.” Nêçîrvan kevîrek li serê rovî xistîye û çûye bajêr postê rovî ji xwe re bi gelek pera firotiye.

XÊR E AN ŞER E



Rojekê mîrek di xewna xwe de dibîne ku diranê wî hemû ketine û nema kare tu tiştî bixwe. Di vê xewna xwe de dikeve tengasîya û bi bêhnek teng ji xew radibe. Dike qêrîn û bangî wezîrê xwe dike, dibêje bi lez, zû bela serekê xewnbiwêj bê pêşberî min!

Di demeke kurt de biwêj tê pêşberî mî disekine. Mîr xewna xwe ji biwêj re dibêje û pirs dike; ka bêje bê xêr e an şer e, ev îşareta çîye? Xewnbiwêj hebekî bi tirs serê xwe dixê ber xwe û bi awayekî fedîkirî dibêje: “Mîrê min bi nerîna min ne xêr e şer e. Wê temenê te gelekî dirêj be, yanî wê jiyana te gelekî dom bike. Lê hemû xwedîyê te, yanê malbata te hemû yek bi yek wê li ber çavê te herin ser dilovanîya xwe. Tê êşa hema bibine û di dawî de tê bibîne ku tu bê kes û bê xwedî maye.”

Şah çend demhûra bê deng dimîne û ji nişkê ve, bi dengê bilind lê hiltê û dibêje: “Zû vî bavêjin zindanê! Bela zanibe dew birê mast e, an bê agahîya qeda û bela çawaye bi çavê xwe bibîne.” Wezîr û çend berdestkê mîr xewnbiwêj digrin û dawêjin zindanê.

Mîr dîsa ji wezîrê xwe re dibêje; herin xewnbiwêjê herî zana yê li derdorê an ji dervî welat peyda bikin û werînin. Di

demek kin de xewn biwêjik din tînin pêşberî mîr. Mîr xewna xwe jê re dibêje û pirs dike; ka tu bêje bê wateya xewna min çîye, şer e an xêr e?

Xewnbiwêj hebekî di xwe de di fikire. Dûra dibêje: “Mîrê min xêr e. Li gora xewna te temenê te ji hemû kesê malbata te zêdetir e. Hîn gelek salên dirêj tê karibe welatê xwe birêve bibe.”

Îca mîr dibêje du kîs zêr bidin vî xewnbiwêjî. Ên ku ji serî de li vê rewşê guhdar kiribûn ji biwêj dipirsin, xewn biwêjê berî te tiştê weke te anî ziman, çima mîr ew da girtin lê tu xelat kir. Xewnbiwêj dikene û dibêje; rast e şîroveya me herdûka weke hev bû, lê ya girîng ewe ku mirov fikarê xwe bi çî awayî bîne ziman.

DÎK Û ROVÎ



Li herema Botan gundekî gelek dûrî bajara hebû. Di wî gundî de maleke mezin û pir maldar hebû; pezê wana, dewarê wana, mehîn û qantirê wana wilo pir bûn rê di hewşa wana de nemabû. Ji bilî ewqas mal û mewdan, di hewşê de mêjdanek mêşê hingiv û koxikek mirîşka jî hebû. Lê ê herî bi qedir kûçikê hewşê Kundo bû. Dema Kundo li zozana bû, navekî wî yê din hebû, jêre digotin Gurkuj. Gelekî bilind û bi heybet bû. Mirov jê dibehetî.

Lê rojekê rovîkî terrî dirêj tê dora gund û bala xwe dide wê hewşa maldar. Bi tiştê ku didîtin pir dilxweş bibû, nêçîrê ku ji wir bike tanî ber çawê xwe û diket xeyalan. Ji xwe re digot; ez ê mîrîşkek mezin bigrim û hemî buxwim û dûra ez ê ji xwe re razêm heya sibehê, wî çaxî hewcebûna min bi xwarinê namîne.

Lê xwedîye malê wê rojê qet nesekinîne. Êm û av dane dewara û pez, heya evarê bûye xirexira wan li viyalî û li wi-yalî. Rovî ji xwe re dibêje; belkî bi şev ez karekî bikim. Lê dema dibe êvar çima Kundo nayê û pal nade di devê deryê koxika mîrîşka de û hew radibe. Tu çar rovîya bi hev re têxe ser hev nabin bi qasî Kundo. Kundo weke cenawarekî ye, nerîna wî bes bû ji rebenê rovî re.

Rovî bi bêhnek ne xweş û teng berê xwe da daristanê û meşîya. Ji xwe re digot; ez ê sibehê dîsa bêm û binerim, dibe ku ez karibim ji xwe re mîrîşkekê an dîkekî bigrim. Lê zanî-

bû ku Kundo li malê ye. Kundo çavê wî vekirîye, lê bi rastîn di xew de ye. Rovî ji xwe re digot; çima wilo xuya dikê. Rovî carek din ji xwe re digot; di vê rewşê de ne mumkun e ku ez karibim têkevim hewşê.

Pîştî bû sibeh rovî dîsa berê xwe da gund û meşîya bi miqabilî gund ket û nerî lê li çî binere! Malbata mezin, ji biçûk û heya mezina hema xwe kar kirîye û dixwazin herin bajêr. Pir kêfa rovî hatîye. Dinya havine, piştî demê nîvroyê gelekî germe. Kundo ji germa ji hal de ketîye wilo sist bûye. Ji xwe Kundo bi şev heya sibehê ranezabû ji bo ku rovî nekeve koxka mirîşka. Çaxê ku dimeşîya mirov digot qey wê nihaka bikeve ser rûkê erdê. Kundo hew debara wî dibû; çû ket xaniyê xwe, çavê xwe girtin û ket xewa şêrîn.

Çaxê rovî ev rewşa Kundo dît gelekî pê kenîya. Pîştî amintîya rovî hat ku Kundo razaye bê deng û bi hêdîka ket hewşê. Û bi alî koxka mirîşka de çû. Nerî ku mirîşk êm dixwin. Rovî bi devê xwe derî vekir, xwe çem kir mirîşkekê û di derî re derket. Berê xwe da daristanê û bi çolê de baz da. Rovî wilo bi xurtayî mirîşk girt û bir, mirîşkê din qet pê nehîşyan.

Rovî pîştî mirîşka xwe bi dilê xwe û bi tahmek xweş xwar, şeva xwe li daristanê di hundurê qurmê darekê de derbas kir. Pîştî danê êvarî rovî dîsa xwe berda dora koxka mîrîşka dîsa Kundo ji germa ketibû xew. Roviye me dîsa ket koxkê û rahişt mirîşkekê û derket bi lez berê xwe da daristanê. Dîkekî sor hebû ew jî di koxikê de li ser lûs bû û di şibaka koxikê re li jiderve dinerî bê çilo rovî mirîşkê dibe, weke ku ji xwe re li filmê sînemê binere. Dîk xwe zû da

hev, firrek li xwe xist û li nivê koxikê danî. Heya jê hat jî bi dengekî bilind ban da ji bo ku Kundo şîyar bibe, ango kari-be rovî bigre. Dîkê sor ji mirîşka re got, ji bona dengê xwe derxînin. Mirîşka hema bihev deng derxistin û gotin qit qit qidaq û bi vî awayî dengekî pir hilatî hat holê.

Piştî gelek deqîqa Kundo hîn nehatibû bi hewara wana ve. Piştî çend seata nûka Kundo rabû û hat bi alî koxikê de. Bi dengekî zirtî bi ser mirîşkan de hilbû û got çima we ez ji xew rakirim. Lê ji xwe re bê deng digot raste ez gelekî razame. Divê ez hinekî ji xwe re bigerim.

Di wê kêliyê de dîkê sor hat û ji Kundo re ta bi derzîyê vekir. Dîkê sor qala rovî dikir û digot ev du roj çêbûn wî rovîyê haram du mirîşk revandin. Kundo gelekî mabû ecêmayî. Ji xwe re digot çilo ez li vêderê weke kerkî sekinîme û ev rovî kare bê heya vê koxikê. Kundo gelekî qeherîbû, çilo çawa ev rovîye haram min bi qurûşekî nahesibîne. Ev çi cesarete gidî! Heger ku rokê ez wîna bigrim ez ê dinyayê li ber çavê wîna reş bikim.

Kundo bankir dîkê sor û jêre got; min planek çêkirîye. Dîk pirsî plana te çawaye. Kundo bersiv da û got ez ê weke berê têkevim mala xwe weke ku ez razayî me lê çaxa rovî hat tu ji min re bêje ez ê derza wî bidêmê.

Wexta 'esir hat, rovî dîsa birçî bû û berê xwe da koxikê. Dîkê sor çend bask li xwe xist û Kundo bi xwe şîyar kir. Rovî ket hundurê koxikê û nerî ku Kundo pêşberî wî ye. Hindik mabû rovî bi xwe de mîz bike. Rovî yê menî delal pir lêxistinek xweş xwar. Û bi revî revî bazda bi çolê de. Piştî wê rojê rovî hew hat dora koxika mirîşka.